

1

1995

di vê hejmarê de

Selîm Berekat
Hevpeyvîn

*

Newafo
çîrok
-Nizar Agirî-

*

Gogol
Palko
çîrok


*

Brodskî
helbest

*

Uzunname
lêkolîn
-Rezo Osê-

DUGIR





dugir

kovara kurdî li derveyî welêt li gor rêziman
û vekîta zimanê kurdî ya
Mîr Celadet Bedirxan
dê her sê meha carekê bête weşandin

sal: 1

heziran 1995

jimar: 1

Xwedî:

Dr. Saîd Mele

Birêvebirên kovarê:

**Ehmed Huseynî
Zagros Hajo
Yehya Yûsif**

pergala rûpelan:
M. Lewendî

berga pêşîn û
berpirsiyarîya hunerî:

**M. Seîd Huseynî
(S. Rêzanî)**

Adres/Navnîşan:

**DUGIR
BOX: 3437
165 23 Hässelby
SWEDEN**

Telefon:

46-8-36 65 16
46-225-15 873
Faks:
46-225-15873
46-225-14406

Postgiro:
692357-7

Abonetiya salane/year: 150 SEK

ISSN: 1400-5913

Pêşgotin

DUGIR, wek pirojeyeke hewldanê, ji bo vejandina peyva kurdî, dê beşdarî bizava dîroka îroyîn bibe, ev beşdarî jî dê ziman, wek alav ji bo avakirina çend xal û pirsên balkêş rakêşîne gorepana guftûgoyeke girêdayî bi sewiyeta hişyarî û zanîna rewşenbîrê kurd li welatên mişextî û penaberiyê

Renge ji destpêkê ve hewldana me têkçûyî be, renge di tengerê û duryanên xewna kujdar de cihêkî dilovan ji vehesîna giyanên zuhabûyî re peyda nebe, renge em bi bişkiwîna arezûyan û bi gulvedana zersosin û sorgulên çav qerimî şa nebin, renge jî, li ber dengê gurmîna rûdan û bûyerên dramatikî yên welatekî birîndar, ne peyv bikaribe li hember gullebaranê raweste û ne jî ziman bikaribe hêvî û xwezayan di gulistana xwe de bihêwirîne. Lê DUGIR wek piroje, dê li welatên seqema gawirane li koşyêke aramê bigere, ev aram dê ne arameke xav û zuha be, çinkî dê bi guliyên êgir û bi werisên nalîneke dijwar dorpêçkirî be.

Di wê koşyê de hewldana bercestekirina xewnê dest bi qolincên ji dayik bûnê dike.

Wê gavê ji dayikbûn bersiva mirinê ye.

Wê gavê hewldan jî ji xwe re rêçekê ber bi ronahiyê de diqelêşe.

Wê gavê piroje dest bi gava pêşîn dike da ku çar gulên reng qedexê li ber kêla miriyên DUGIR a bi xweliyê nixumandî, biçîne.

Sawa herî kovandar a ku me hogirî hewldanê dike ku em bikaribin pîrekê di navbera xwe û welêt de damezirînin, ku em bikaribin peywendiyêke gur û germ di navbera derve û hundir de, di çarçewa dan û stendineke rewşenbîrane de bi alavên afirandin û dahênana rastîn, bigewde bikin.

Derve wek serencama dûrketina ji himbêza mehreban û jiyana di nav pencên bêrîkirin û bîranînan de. Wek şaristaniyêke cihêreng û zimanekî nuh, wek nakokiya di navbera rojhilat û rojava de; nakokiya civakî û siyasî û aborî û rewşenbîrî û hişmendî û psîkolojî.

Hundir wek azar û êş û bindestî û hejarî, wek mirin û kuştin û koçkirin û talankirin û kêferata rojane ji bo bi destxistina nasnameyêke netewî û çareserkirina çarenûsa miletekî ku li ser devê sînoran sirûdên azadiya xwe bi xwînê dineqîşîne. Hundir wek bizaveke ronakbîrî ku di bin sîbera tirs û metirsiyê de zimanê xwe diparêze, kesayetiya xwe diçesipîne, çand û wêje û toreya xwe vedijîne.

Bi avakirina pîrê û bi damezirandina wê peywendiya gur û germ, renge, herdû rexên hevêşê bikaribin bi hev re îstgehên tirajîdyayê gelê kurd ronî bikin, naverokê jî dîroka şîmî û renckêşanê re bibînin, û alavên derbirîna hunerî ligel kûrahî û berfirehiya wê tirajîdyayê biguncînin.

DUGIR

Hunermendekî Kurd

Ebdulrehîm Husên (Rehîmo)

Di 1957'an de li bajarê Amûdê ji dayik bûye. Di 1991'ê de ji Akademîya Hunerên Sipehî ya Şamê dîploma hunera resimkêşanê wergirtiye. Beşdarî gelek pêşangehên hevpar bûye. Ji 1993'an û vir de li Belçikayê dijî.





foto: Arif Zêrevan







Naverok

10

Selîm Berekat
-gotin-

11

Selîm Berekat
-danasîn-

12

Selîm Berekat
-hevpeyvîn-

15

Selîm Berekat
-bîranîn-

19

Rezo Osê
-Uzunname-1-
lêkolîn

23

Rindê Çeçan
-Ji bo te(helbest)-

24

M. Efîf Huseynî
Dengbêj (çîrok)

27

Brodski
-Dilokeke mezin bo John
Donne-
w. Ehmed Huseynî

33

Gogol
-Palto (çîrok)-
w. Narîna Haco

37

Tengezarê Marîni
-Valahîyeke sênckirî-
(helbest)

39

Nîzar Agirî
-Newafo (çîrok)-

41

Ehmed Huseynî
-Naaa!! (helbest)-

45

Pirsa Gelê Kurd
Li Başûr-Rojavayê
Kurdistanê

Selîm Berekat

Gotin

Ez zimanê Kurdî ya devkî dizanim, çinkî ziman wek nivîsandin qedexe bû, herwisa qedexe bû -jî-ku em bibêjin em Kurd in.

Dêmek êrîş li ser nasnameyê bû neku li ser zimên bû, zimanê ku yek ji me dikare bi lalî bi kar bîne. Taybetmendiyeên nasnameyê (huwiyetê) dikarin rêça hebûna surgunbûnê û hebûna surgungehê destnîşan bikin.

Vêca nivîsandina bi zimanê biyaniyan ango zimanê yê dîtir hestekî di cî de ji bo herifandina newekheviyê pêwîst nake digel wê labîrênta piçûk a ku nakokî wê ji dayik dike, lê eger hewldana te ji bo derbirîna nasnameyê qedexe bibe, wê gavê sirgun dest pê dike.

Ez Kurd im. Erê, dikarim giyanê xwe bi hezar zimanî derbibirim. Lê, wexta ku zimanek tenê ji wan zimanan hewl bide ku kurdayetiya min merbend bike, wê wextê sirgun, çi li vir an çi li wir, di dojeha ku desthilatdarî ji xwe re dike qanûn daku nakokiyên ji holê rake, dest pê dike.

Kurdayetiya min wek nasname bi zimanê Erebi dewlemend dibe. Ji bo ku êşa min bikaribe mukurhatina xwe pêşkêşî cih bike; zimanê erebî gorepana azadiya min e.

S. Berekat

Selîm Berekat

Danaşîn



Selîm Berekat yek ji Kurdên erebînivîs e. Di cîhana wêjeya erebî ya nûjen de rolek balkêş ji bo herifandina şêwe û awayên kevnar, çî di warê helbestê de be û çî jî di warê romanê de be, listiye.

Di hemî berhemên xwe de li ser rewşa gelê kurd radiweste, hewl dide ku tirajediya Kurdan bi şêweyekî hunerî bigihîne wijdan û hestên xwendevanên ereb.

Di sala 1950'î de li gundê Mûsêsana ji dayik bûye, piştî kutakirina hersê qonaxên xwendina xwe li Qamişloyê, dest pê dike û li xwendegeha bilind li Şamê edebiyata Erebi dixwîne. Di sala 1974'an de ji Sûriyê derbider dibe û li Lubnanê dihêwîre. Ji sala 1982'an ve li Qubrusê bi cî bûye.

Selîm berekat sê pirtûk li ser zaroktî û ciwaniya xwe nivîsandine; yek ji wan hatiye wergerandin ser zimanê Firansî û Elmanî. Di warê helbesta serbest û nûjen de şeş pirtûk û di warê romanê de pênc pirtûk nivîsandine.

Ev hevpeyvîna wî di rojnameya El-Heyat de beriya nuha belav bûbû û ji ber ku hevpeyvîn pir dirêj bû, me ev herdû pirsên ku bi nasnameya wî ve girêdayî ne wergerandin Kurdî.

DUGIR

Selîm Berekat

Derveyîn

"Min hewl daye ku kûrahiya xelkê Kurd zeft bikim"

Pîrs-Di herdû pirtûkên xwe de (Sîsirkê Hesinî û Ka Bilind Bide Min) tu li ser zaroktiya xwe di cîhana bakur de dipeyivî, cihêwaziya vê zaroktiyê çi ye da ku wisa di du pirtûkan de û di hemî berhemên te de bête bi cî kirin, ez dixwazim tiştine dîtir li ser jiyana te ya li wê herêmê, li ser meriv û doistan, li ser malbatê, ji te bibîzîm?

Bersiv-Yekcar tişteki taybetmend di zaroktiya min de nîn e. Zaroktiyeke têkçûyî bû wek hemî zaroktiyên dîtir li vê rojhilatê. Mişt qedexeyî, bi sawa mezinê ku bi darên xwe diçûn û dihatin dagirtî bû.

Bi wê karîna malbatek sade ku gerdûn bi pîvanek ji gewdeyê Newton mezintir şirove dikir, dagirtî bû. Mebesta min gewdeyê Gamêş e: Gerdûn li ser qiloçên Gamêş rawestyayî ye. Li hawirdora te hemî cih bi giyanan dagirtî ne. Cinên çak, pîrevok û firişteyên xwedan defterên mezin ên hesab.

Hemî aliyên zaroktiya te dorpeçkirî ye, gerek tu li kirinên xwe mikur bê, tu talanbûyî yî, hêviya ku tu razîbûnê qezenc bikî nîn e, hêviya ku tu sezayê sivik bikî nîn e, di temenê xwe de tu xelatekê wernagirî, seza bi dû sezayê de, hînkirineke bêhempa da ku tu yekî dî bî, wisa ji malbatê ta dibistanê ta

dewletê, pişt re di Meslexa yê di de mirin çavliremana te dike.

Zaroktiyek wek hemî zaroktiyê tu tiştê ku wê cihêwaz bike nîn e.

Tîrsa normal her û her ew bi xwe ye, hînbûna dek û dolaban, fen û fûtan pêwîst e da ku tu ji sezaya ku dê bibe xelata gunehkariya te ya ebedî, rizgar bibî, gunehkariya ku çima tu zarok ji dayika xwe bûyî.

Her tişt te dehdide da ku tu mezin bî, gerek tu ji malzarokê bi mezinahî amade bibî, gerek tu belgenameyek ji belgenameyên xeybê bî li ser (çêkirina) bûnewerê razîbûyî û qayil û kêfxweş, mebesta min ê melûl û ne şirovexwaz.

Pirtûkên ku min li ser zarokti û cîwaniya xwe nivîsandine lîskek e, lîskek ji derveyî, pêşbirka ku di navbera hişyarî û pêwîstiya hetmî de li ser hatiye lihevkirin bo zaroktiyê li rojhilat, ku ew bi xwe dengvedana nezaniya mezinan e, metirsiya wan e, hêviya wan e jî ku bi alîkariya zarok tişteki qezenc bikin, tişteki ku wan bi xwe nikarîbûn qezenc bikira çînkî ew bi xwe têkçûyî ji dayik bûbûn. Min li ser vê têkçûna ku xwe dirêjî mezinan kirîye, bi awayê wênekirina têkçûnê wek wêneyek qederiyanê ji wêneyên zaroktiyê, min nivîsandiye, min daye wênekirin ku têkçûn zarokti bi xwe ye.

Renge jiyana xelkê û qedere

wan hinekî bi rewanbêjiya lêbûrîner hatibin nivîsandin. renga di rastiya xwe de rûdan ne wilo bin lê, nivîsandin tirsî ji sedîsedkirina tiştan e, madam min li ser çarenûsan di Bakur de nivîsandiye, ez venaşêrim ku carina min ew bi hinek bitrî re guherandine. Ev ne lêmikurhatine lê destnîşankirine ku çawan nivîsandin dikare diziyê ji perawêza deqekî giranbuhatir, xwînamêz, pêkenîner, ku bi jiyanê qayil nabe, bike. Zaroktiya ku gerek bihata vegotin tu carî dê neyê vegotin çinkî renga bighêje pileya derewan û kufre: Ew zaroktî tiştêkî din bû, ji ezela xwe ta ebeda xwe birîndarkirî bû, veçirayî bû, êşdar bû, derzdar bû, şewatperest bû, westankar bû, li cem hemî gelên dîtir di hemî pileyên temenan de di çesnê wê zaroktiyê

de nîn e

Îro, dema ku ez li dorhêla xwe li zaroktiya van

bûnewerên piçûk, li gelek rexên cihanê, temaşê dikim, ez nabêjim ku çêtir e yan jî nizimtir e lê bêguman ez dê nikaribim bidim dannaskirin, û dema ku bi awirên çavê xwe yê tarîbûyî li zarokê xwe yê bi tenê temaşê dikim bêpariyek diwar ji zaroktiyê min ji wî dût dixîne "Xwedayo!" ji xwe re dibêjim û berdewam dikim; Ez dê ji ku dest pê bikim, da ku ez zarokatiya wî binasim.

Mezînan, çinkî tirsî ji sezaya axretê kûrahiya hinavên wan dagîrkiribû, dixwestin, ta pileya dawîn ku em zîrek û şareza bin ku em di hundirê çarçewa êşê de hozan û hosta bin, ji xwe eger ez li ser herêmên êşê di serpêhatiya zaroktî û ciwaniya xwe de bipeyivim dê tîp bihejin, bireilin, dê yê xwendevan

guman bike ku ez ne li ser hişê xwe dipeyivim, ku ez serpêhatiya xwe dikim pêşengeha hetikandinê.

Belkî rojekê ji rojan ez wê binivîsînim bi mebesta ku ez tola xwe ji jiyane bistînim, eger hat û bû dê lêgerînek diwar be, lêgerîna li peyven dirindane yê di paş êşê de, ku li wir, qet, zaroktî nayê rêzkirin.

Ma gelo ez xwe didim vî alî û wî alî? Bi piranî me tu zaroktî nediye.

Pirs-Gelek caran, di wêjeya te de li ser doza nasnameya Kurdî hatiye peyivîn. Tu çawan li peywendiya xwe bi vê nasnameyê re temaşê dikî, hin dibêjin ku wêjeya te pir egoyist e, bi daxwazek kilasîkî ji bo bigewdekirina vê nasnameyê ye, angû Necîb Mehîfûzekî kurdî di romanê de?

Min xwestiye ku kurd di çepera herî diwar ya nivîsandinê de bin

Bersiv-Ez bawerim ku nasname ev peyva pir ne zelal, li cem hinekan, ku

çiqasî pê hatibe listin jî, angoya pêvajoyeke nijadî werdigire, herwisa angoya newkheviyeke mumkin û sinorê ji yê dinê cihêxwazî ji bo xwe çesipandinê di çarçewa yekîtiya hevbeş û giştî de, werdigire. Di vê de afsanek pir mezin peyda dibe.

Di kîjan yekîtiya mirovî de be ku çiqasî sîmayên wê yê çandeyî û olî û nijadî dîmenên tenhatiyê wergirin, dê wekheviyeke giştî tê de peyda nebe, bêguman dê nakokî êşkere bibe, di revakirinê de, di mulkiyetê de, di desthilata şexsî de û di parastina fermanê de. Min xwestiye ku ez xwe bavêjim dîwarê li paş nasnameyê da ku ez çarenûsê derbibirim, çinkî li wir pêvajoya xweçesipandina min peyda dibe wek qederekê di nava qederan de ku nasnameya min li wir e.

Ma gelo ez Kurd im? Erê, dêmek de bila bi azadî, bi hêsaniyek diwar, ez bikaribim bibêjim ku ez Kurd im, ku navê bavê min navekî Kurdî ye, ku em bi Kurdî bi hev re, bi mirîşkên xwe re, bi berxên xwe re, bi çêlekên xwe re, bi mêşênhunguv re, bi bexçeyên xwe re dipeyivin, tenê wilo. Cih wek cografîya di seqema xwe de, di gemkirina xwe de, di talankirina xwe de, di zordariya xwe de û di kuştina xewnê de ji bo me û ji bo xeyrî me wekhev e. Lê wexta ku ji bo me duqat bibe, bibe newekheviyeke komedî wek komediya reş, wê gavê em ber bi xwe de vedikişin, ber bi kozika xwe de ya pir tenhatîxwaz.

Di dibistana navîn de, carekê tiştêk bi min re çêbû hetanî îro jî ez ji ber vedijiniqim. Dersa me li ser tevgerên cihêxwaz, ji wan tevgeran jî tevgera Kurd, bû. Ez nizanîm çawan zimanê min şemitî û min tiştêk li ser kurdbûna xwe got, şagirtê ku wek leşkeran amade kiribûn, di cih de karbidestên dibistanê agahdar kirin, kî bawer dike ku di destpêka ciwaniya me de hin şagirt tenê ji bo gelaciyê amade kiribin. Birêvebirên dibistanê civînek wek encûmana cengek rastîn li darxistin. Piştî danûstendineke diwar ku hestiyên min ji ber dilerizî, mamostayekî komunist wan bi berdana min ji dibistanê haş kir, çinkî wana ne tenê dixwestin ku bera min bidin lê ligel wê jî dixwestin ku min radestî parastina leşkerî bikin.

Ez bi xwe di derdekî netewî de hiç neramiyabûm, mala me ji regezperestiyê xalî bû, bavê min mirovekî oldar bû, bi yek pîvanê li hemî gerdûn temaşê dikir. Ha va piştî bîst salan ji mana xwe li tenişt doza Ereban a yekemîn ez ji xwe

dipirsim: çawan dikaribûn zarokine piçûk şazde salî ji bo gelaciya Kurdan bikaribînin?

Wek ku av av e? Hişê min li wir ma, di navçeya xwe yî Kurdî de dijî. Lê bi nisbetî nasnameya min wisa ye: Bi kurtî ez naxwazim ku ez tiştêkî din bim!

Carekê nivîskarekî Erebi î pir bi navûdeng ku şanoyan û senaryo û helbestên mişt nakokiyên komedî dinivîsîne, ez bi regezperestiyê û bi dijminatîya Ereban gunehbar kirim!!! û belge?

Ez li ser Kurdan dinivîsim. Hawar hey hawar (ew bi xwe partiyek ne erebi diparêse) lê S. Berekat Ereban bi kêsek pîvaz difiroşe. Wî bi xwe jî piştî Şerê Hizêranê di şanoyeke xwe yî rexnekariyane de û di germa rexneya zatî de hemî dîroka Erebi, nizanîm bê bi çi firot!

Min bi wî awayî li ser ereban ne-nivîsandîye. Ev serê 17 e salan e ku ez doza erebi ne ya kurdî di nivîsa xwe yî heftane de, wek rojnamevan, li ser milên xwe dikim. Lê eger ez qehremanên romanên xwe ji navçeyek din binim, tiştêkî seyr e ne? Kurd bi vê cografyayê, bi hiş û bîra vê cografyayê şêrêzkirî ne.

Ji bo beşê diwemîn ji pirsar te. Min hewl nedaye ku ez realîta kurdî wek dîmen wergirim, mîna Necîb Mehîfûz ku (dîmena Misrî) bikartîne. Na Tu carî min wilo nekirîye û nakim. Min tiştêkî din kirîye: Min hewl daye ku ez kûrahiya xelkê Kurd zêft bikim, wek hebûn zêft bikim, ne wek çîrokan li ser bûyerên kolanên wan û hundirê xaniyên wan, min xwestiyê ku kurd di çepera herî dijwar ya nivîsandinê de bin ku çarenûs li wir nabin dîmen, lê di tîrbûna nexuyayî ya jîyanê de dibin gurmîn.

•••

Selîm Berekat

Bîranîn

Xwezka ey zaroko xwezka!

Tu çi dibînî ?

De ji min re bibêj hey zaroko bê tu çi dibînî!?

Du girik di aso de dixuyin, gerdeniyeke ji gundan û axeke ku di navbera havîna serserî û zivistana kawik de li ba dibe.

Civana te hey zaroko civana ligel şinahî û balendeyan e.

Tu çavên xwe bi ser sibehên ku ji selikên xwe serçavkan diweşînin, digirî. Tu hişk bi rişmeke nediyar digirî mîna ku tu xwe ji pîrbûnê re amade bikî yan jî pîrahî xwe ji te re amade bike, da ku hûn bi hev re wê efsaneya ku carekê tenê dijene; kurt bikin; efsaneya ku jiyan ji bo dûbarekirina jena wê xwe dukuje.

Xwezka hey zaroko, tu tiştêkî dîtir ji bilî wan tiştên ku te dîtîye, bibînî.

Ma gelo te çi dîtibû?

Ma ji bilî nalîna erebanan û çavkaniyên ku ji zixtên tozê bazdidin , de ji min re bibêj te çi dîtîye!?

De sextekariya forman rawestînin da ku form li te ewle bibin. De min najo bi alî wan hevalên ku reh û tov himbêz kirin û serên xwe bi hêminî danîn.

Lê, tu bi Xwedê kî, tu yê zorbaziya ewran û berfê ji ser min sivik nekî. Ez te di navbera wan de dibînim, tu çûkan û demê serjê dikî, tu ji boyî zaroktiya zemînê kûrekûra xwe li ser dêmên zemînê belav dikî, tu xefk û dafên xwîna xwe yî serxweş belav dikî da ku tu dastanê qezenc bikî.

Tu zarok î, ma ez çi dikarim ji zarokêkî bixwazim ji bilî ku bakur gişî ji ser cil û bergên xwe dawêşîne. Bakur gişî, mal bi mal; dar bi dar; rûbar bi rûbar; bender bi bender; gulgenim bi gulgenim; tav bi tav; ma ez dê çi bixwazim ji bilî ku denên asoyê bişêkîne da ku refên hehecîk û qitikan birijin?

De birrev!

Bi qasî ku lingên te bikaribin ji babelîskekê berbi babelîskekê ve birrev!

De ji xweşiya deştan re dilê xwe yî piçûk bilind bike; deştên ku bi tîpan û cîqan di ser dev re çûbûn.

Ma di dengê te de dengekî wawîkan nîne?

Ma di dengê te de dengê derzekê nîne?

Ma ew xweşiya têkçûyî ya ku di pesindanê de peyda dibe di te de jî nîne?

Tu zarok î, ma ji bilî asoyekî mişt bager, kî dikare bageran di te de dîl bike?

De rê bide min da ku ez xwe li bin siya mertalê te wek bobelatekê ram-idînim.

Destên xwe ji şolikan re, ji roavahiyan re vedikim, wek evîneke windabûyî, wek evîna wê koçbariya ku qazmên xwe li bûneweran rakişandiyê û tu zarok î, de ji min re bibêj te çi ji "zarok" dîtiye? De bibêj!

Min dengê te rût di nav dangan de dît, dengekî bînçikyayî, mîna kezebeke şikestî ji terk û derzan başok dipekiyan û das dipijiqîn.

Axxx ! Hey zaroko! Min te çiqasî di çîrokê de bi çavine vekirî dibihîst, te dilê xwe yî piçûk ji serpihatiyê re rêzdikir, erê tu ji serpêhatiyê re lîska beybûnê rêz dikî.

Tu ji bîr dikî bê te çawan bi xencera xunavê xaniyên Birîva û Mûsêsana û Amûdê û Kêstekê û Buharengê û Mozan û Sêmitik û Hilko û Kûçikê û Interiyê û Tirbesipiyê û Agûlê û Heremreş û Heremê Şêxo birîndar kir.

Tu zarok î, erê tu di bêrikê xwe de şoqilên bejî berhev dikî, tu kulîlkên gulpîvongan berhev dikî, tu hewl didî ku pasvanên genim te bibînin da ku tu wan bixapînî. Ew pêkenîna te ye; pêkenîna serxweş mîna xwîna te yî serxweş e, pêkenîna te ew di nav xefk û dafên xwe de ji bax û bexçeyan re vedida; û dema ku bax û bexçe di xefkin te de werbûn tu keniyayî û sira bayî jî li hawirdora te dikeniya.

Te û bayî bi hev re radên xwe qoçan kiribûn, we bi hev re li zurneyekê dixist da ku hûn serserîtiya bûneweran raperînin. Bêguman, piştî vê mişextiya bêserûber; me naskir ku tu bûyî.

Tu bûyî yê ku rêça erebanên hejîran kola bû; bi qirşik û çiqulan nixumandibû da ku qantrên Semano tê de werbin û piyên wan bişikên..

Tu bûyî yê ku têla kontakkirî bi dergehê firna Murado ve girêdabû; ku her yek dihingivî têlê diqîriya..

Tu bûyî yê ku gundor ji ser bên bi ser kûçikê Felemezo de gindirand û ji nêvî de ew pûç kir.

Tu bûyî yê ku dikê Hêlanê yê qirik rût û kumik bi kevir birandî, kuştibû.

Tu bûyî yê ku îsota sor xistibû nav ava qazên Seqmûro de, pişt re qaz har bûbûn..

Yê ku darê Kitam ê kor dizî bû, tu bûyî. Yê ku quloçê beranê Mîro

şikandibû, tu bûyî.

Yê ku dixwest goristana Hilêliyê gor bi gor veke da ku bibîne bê çawan mirî di veşartgehên xwe yî teng de bi hevûdû re dipeyivin; tu bûyî; erê te xew dikir û xewna te jî ew bû..

Lê tu zarok î!

Ma kî dê zarokê ku bi birûskên beybûnan hatiye lêdan û di navbera şinahiyêke teze û ewrekî teze de tar û mar bûye; sûcdar bike!??

Ax, me çiqasî ji te re got: Nêzîk nebe!. Nêzîk nebe hey zaroko, nêzîkî kavilan nebe, lê tu nêzîk bûyî da ku tu jibermayên kaşê ji ser kavilan berhev bikî; da ku tu sirûd û dîlokan bixemilînî...

Bêguman me dizanibû ku li seranserî qonaxa vê giranxewa ku rehên xwe ber bi gavên me de ajotiyê, tu hişyarbûyî bû. Giranxewa ku mîna gustîlkekê li ser eniya serkeftinên me nîgar kiriye. Lê ji bo çî te em aniha şiyar kirin û te em sipartin tinaziyê, ji bo çî hey malava!??

Em mezin in hey zaroko! Mezinine ku li ber dergehê demê bi çîngeçînga hesin dilîzin û kanzaya (maddeya xam) sarkirî dibarînin. Em mezin in; em qedêrên xwe ji hehecîkeke neagahdar û ji xweşiyekê re nabilînin. Em ji bilî hişmendîya hêzdariyê li bejna xwe nakin.

Eger tu hewl didî ku careke dî xwe di paş pinpinîkekê de veşêrî li hêviya me nemîn; çînkî yê me; em dê li bin vê çîngeçînga bêdeng a rolên bêdeng rawestin, em dê rawestin û em dê quloçên bizinan li beramberî pêvajoya pêkenîne bilind bikin.

Lê te bi şiyarbûna xwe re em jî şiyarkirin da ku em bibînin ku çawan tu derbasî dergehê şinahiyê dibî; ku çawan li pey te stêrka rijayî ji avê û ji perîkan bû. Da ku em te di nav çekên sibehê de bibînin ku çawan tu deştên Kêstekê bi alî Nîsêbînê de dehf didî; ku çawan tu guh nadî pasvanên sînor û bajaran; pasvanên ku tîr ji kevanekî lal berdane kêfxweşiya te. Wê gavê tu mîna dilekî sermest ramidandî bûyî û mîna dilekî sermest tu mayî ramidandî.

Ha va tu me bi çavên serê xwe dibînî (Em ên şikestî û bi şûn de vegeryayî) ku çawan em ji newalekê berbi newaleke din ve bazdidin, da ku em bişûnde vegera layan ji ser xwe rawestînin; da ku em anihayîya bêlay nebînin.

Erê...Erê, de hema dirêjkirî bimîn hey zaroko! De hema zarok bimîn lo! Mane ev daxwaz a reh û tovan e, mane reh û tov bi vî awayî dil dibijînin te.

De îca den û çeydanan bi qasî ku tu bixwazî bişikîn, ma ne tu di serserîtiya xwe de şîrîn î, tu di desthilatdariya xwe yî bêmînak de şîrîn î...

Dema tu çepera li dor gulên radîkî û tu gulên diperpitînin, tu şêrîn î...

Dema ku tu li ser piştê berên siwar dibî û tu wî har dikî, tu şêrîn î...

Ku tu keviran davêjî çavkaniyê û çêlekên li ser avê vedicîniqînî, tu şêrîn î.



Ku tu gumgumokan digurînî û hêlînên çûkan diherifinî, tu şêrîn î...
 Ku tu şolikan didizî û xefkan li ber kevokan vedidî, tu şêrîn î...
 Ku tu bênder û pisîkan dişewitînî, tu şêrîn î...
 Ku tu gamêşan ji êxur berdidî û tu wan sergerdan dikî, tu şêrîn î...
 Ku tu nikulên dîkên romî girêdidî, tu şêrîn î...
 Ku tu li ser stêrkên xişokane û li ser avên ku baskên balendeyan li xwe
 kirine dipeyvî, tu şêrîn î...
 Ku tu li ser wî hespvanê ku ewran bi qamçiyê xwe dajo, tu şêrîn î..
 Dema tu li ser erebanên di binê çem de dipeyvî, tu şêrîn î..
 Dema tu li ser rovî û nêriyên taristanê dipeyvî, tu şêrîn î..
 Dema tu li ser qantirên por dirêj dipeyvî, tu şêrîn î..
 Tu şêrîn î... Tu şêrîn î!
 Tu bi Xwedê kî tu yê bela xwe ji me vekî!
 Tu yê ji ser pišta me dakevî!
 Lê belê tu, yê şiyar û çav vekirî, tu me jî şiyar dikî da ku em pêkenînê bi
 dar vekin..!

-ji pirtûka Sîsirkê Hesinî-

Uzunname-1

Rezo Osê

Mehmet Uzun

TU

Roman

Min di nivîsa "Biêlim" de soza rawestanekê li ser berhemên Mehmet Uzun dabû. Lê mixabin ku ez nikarim soza xwe pêk binim, da ez derewîn dernekevim, ezê tenha li ser romana Tu rawestim (ji berhemên din re jî xwedakî me heye).

Romana Tu bi kurtî

Romana Tu sala 1984 an, li Stockholmê, hatiye çapkirin. Ev roman jî 220 rûpelan pêk hatiye. Bi du beşan hatiye avakirin. Nexê pêşî jî, di danî-na tevna heyber de, çîroka Kêzxa-tûnê ye. Di rengê avakirinê de, nivîskar xwe dispêre forma têtîran (flash back). Wilo, roman, bi bûyera girtina nivîskar, jî rûpelê pêşî ve, tê hûnan-din û bi mana wî di zîndanê de kutayî dibe. Dema bûyerên romanê, ya di ak-siyona avakirinê de, di navbera salên 1956-1972 an de, kenar dibe.

Gava daner di zîndanê de jî xewa mirinê hişyar dibe, kêzî-keke biçûk û reş li ber bêfila xwe dipelîne. Vê kêzikê dike Kêzxtatûna xwe û hevpey-vînekê pê re di zîndanê de vedike. Di rêya wê re xwe, malbava xwe, bajarên xwe, civaka xwe û hev-alên xwe bi xwêner dide nasîn. Ji hêla din ve jî desthilata xwe, zor û sitem, zîndan û îşkenceyanên wî belû dike.

Nivîskar, bi vî şeweyî, dîroka

jiyana xwe, ji salên zarokî, tanî girtinê, bi dar ve dike û lehengiya

xwe, di romanê de, pê bi pê, gav bi gav, beşdar û berçav dike.

Wilo romana Tu di rêya Kêzxtatûnê re, dibe Uzunname.

Soza berê

Bêguman, rexnê di romana-heybera- Kurdî de cihê xwe negirtiye. Eger hin pelandin di vî warî de hatîbin jî, bi ser ku romana Tu di warê rexnelêgirtinê de, yek ji romanên pêş-kêş e, lê di behweriyên min de, me derdê xwe di vê romanê de jî - weku gelek berhemên din- nas nekiriye, da em karibin derman bikin. Çawa? Ji ber ku em taybetiyên gelê xwe, civaka xwe, zimanê xwe naxin bin kontrol û pîvanê. Ne tenha wilo, lê em li gor pîvanên teorî jî nameşin. Ew pîvanên ku bi asanê (eger em banê asoya têgihîştina xwe di warê rexnan de bilind nekin) nakevin kirasê heybera Kurdî de. Lewra rexne li ba me cih nagire.

Ez li ser vê romanê, ka forma avakirina wê jî ber kîjan romana Tirkî hatiye girtin, zimanê wê jî kîjan kovarên Kurdî hatiye kopîkirin, narawestim. Tenha, ezê ji van

rexne û lêkolînan dûr kevim, da bi rê û şopeke din de bimeşin, dûrî binbariya hemî lêkolîn û rexnelê-girtinan. Wilo, ezê li ser çend xalên taybetî rawestim; ew xalên ku bi ziman û civaka kurdî ve, bi karakter û jiyana kurdî ve girêdayî ne.

Hûn dipelînin, çawa ez mirovekî pelpelokî me! Da em serê hev neçînin, ezê zû li soza xwe vegirim. Soza min jî -eger li bala we be ew bû ku ez li ser şaşiyên rêzimanî, hevokanî (fraziolojî) û romanî, di berhemên M. Uzun de rawestim, va min sukra xwe daye ber nîr !

1. Rêzimanê romana Tu

Pêkenînokeke Rûsî li ser fêrbûna biyaniyan ji zimên re heye, dibêje:

Yê biyanî av ji avfiroşekê xwest, got:

-Av sar li ba we heye?

-Ne av sar, lê ava sar, avfiroşê lê vegerand.

-Naxwe ka zerikek ava bide min, yê biyanî got.

-Ne ava, lê av, avfiroşê lê vegerand.

-Te serê min qoqiland yadê ! Tu pêşî fêrî zimanê xwe bibe, piştî min fêr bike, yê biyanî got.

Belê, aloziyên ziman û rêzimanê me pir in û cihê seknê ne. Lê nivîskarê nêr û mê ji hev cude neke, jîmaran nizanibe û rewşên bernavan nas neke, tiştekî ne di rê de ye û pir kirêt e. Di vî warî de, emê li ser çend bend û rêzên rêzimanî yên di romana Tu de rawestin. Ji wan:

Cînav (bernav, pronav).

Nivîskarê me cînavên forma rast û tewandî ji hev cuda nake. Loma parçên axaftinê, di hevokên wî de, tevlihev dibin. Wilo, kirde dibe têrker û lêker şûna xwe nagire. Belê, nivîskar di vî warî de, xweş dilukume, tanî nema bi ser rastiya cînavê lixweveger ve dibe.

Ez nikarim romana Tu ji nû ve bi-

nivîsim. Lê, ezê gelek nimûneyan pêşkêş bikim û şaşiyên, bê şirovekirin daxim, wekî:

Cînavên kesîti:

di wê zivistana, ku te birin de, (r.11)
Bêguman, polîsan nivîskarê me birin, ne wî polîs birin

Belê taya tirsê te jî girtiye...(r.32)

Te kewek girt , lê tayê tu girtî.

Axir..te heta qereqolê anîbûn.(r.72)
Wan tu anîbûn, ne te ew biribûn.

te ne birin. (r.75)

Wan tu ne birin, ne te ew ne birin.

Ew polîsên ku hatibûn te girtibûn...(r.76)

Ne te polîs girtin , lê wan tu girtin.

Tu rûpela yekemîn qulipand..., li ber tu bû. (r.134)

Kê çi qulipand? Te rûpel qulipand, ne wî tu qulipandî, çi li ber kê bû? Rûpel li ber te bû, ne tu li ber rûpel bûyî.

Bi lez we xistin cemsekê (r.78)

Ne we ew xistin GMC(cemse) de, lê wan hûn xistinê.

We wekî telîsên kayê ji cemsê avêtin erdê û ketin ser we (r.178)

Hûn hatin avêtin, ne we polîs avêtin.

Û we bi dîwêr ve zeliqandin.

Hûn hatin zeliqandin, ne we polîs zeliqandin.

Hûn nikarîbûn bimeşiyana.(r.220)

Hûn nikarin, lê we nikarîbû.

Cînavên arzî :

Bi bejna xwe yê kin ve (R. 86)

Bi bejina xwe ya kin , lê bi zimanê xwe yê dirêj e.

Cînavên nîşankirinê :

Tu bi wê dengî... ve kelegirî bûyî. (r.77)

Tu bi werîs (deng) ve hatî girêdan, lê bi deng re girî (kelegirî bûyî)

têxin wî kunçikê (r.90)

Têxin kû de?. Têxin wê kunçikê de.

Cînavên pirsê :

Kê bûn ew ? (r.71)

Gotin jê re navê, ku dîwana Cegerxwîn (Dîwana 3.) bi navê **Kî Me Ez e**. Qirika Şivan bi **Kî Ne Em** re çirayeye.

Ew kê bû, yê li kêlekê kê bû? (r.74)

Kê kir , kê bir ?...lê , kî bû, kî ye?

Kesên giliyê min dike kê ye? (r.91)

Kesên giliyê min dikin kî ne?(di f.p.j. de), yan jî: Kesê giliyê min dike kî ye? (di f.y.j.de).

Cînavê lixweveger:

We xwe spartin eskeran.(r.177)

(Me, we, wan) xwe spart, lê, wan (em, hûn, ew) spartin xwe (hinan)

Jimar:

Kom û tek, li ba nivîskarê me ti rolê naleyizin, dibêje:

diya te ...dest bi hedîsên wê şevê kirin.(r.25)

Dê bi karekî, bi teka xwe dirabe. Dêmek, wê kir. Li vir, pîşkê kirinê weku makder bi bernavên kesîtî, yên forma tewandî re, nayên guhestin:(min, te, wî, wê, we, me, wan) kir.

Paşê rabûyî..., pîjamên bin balgih derxist, (r.29)

Pîjamê nivîskarê me çend parçe

be jî, her dimîne pîjame, nav e. Lê, eger li serê xwe siwar bibe, gerek wan (pîjamên xwe) derxe.Wilo, dibe:î pîjamê bin balgih derxistî.

Te dîsan çavên xwe vekir, (r.85)

Te çavekî xwe vekir, lê herdû çav vekirin.

3. Daçek:

Daçek jî, li ba nivîskarê me, der-yake nenas e. Di nav pêlên wê de xwe winda dike, dibêje:

û ti li dîya xwe derî vekir....(r.25)

Gava dê di hundir de be, tu derî li wê (lê) vedikî. Lê ku li der ve be, tu derî ji wê re (jê re) vedikî. Dêya nivîskar jî li derve ye...dêmek: û te deî jê re vekir.

Li ser cihê pîmamê te de hat bîra te. (r.128)

Li kû? Li ser cih. Lê, di kû de? Di malê de. Dêmek, daçeka li nîşana cihê vekirî ye û di nîşana cihê girtî ye.

û di mîxekî de. ...daliqandî. (r.132)

Bi mîxekî ve...daliqand. Lê, di qulekê de veşart.

4. Nêr û mê:

Di warê navan û rewşên nêr û mê de, nivîskarê romana Tu, bi ser rê ve nabe. bê ku ji xwe re mijûl bibe, yan jî bipirse, gavên xwe çavgirtî berdewam dike.

Pêkenînokeke kudî heye, dibêje: Ji yekî, ku xwe bi zanîna zimanê tirkî paya dikir, pirsîn:

-Navê kerê, bi tirkî, çi ye?

-Îşek e, yê tirkîzan vegerand.

-Navê çêlika kerê, bi tirkî çi ye?

-Tirk nav lê nakin, piştî mezin dibe, navê wê jî dibe îşek, piştî mijûliyeke dirêj bersiv da.

Belê, nivîskarê me jî dibêje:

Kulavekî şivanan avêtibû ser milên xwe.(r.148)

kulava ser pišta xwe girt û danî

alî. (r.150)

Kulavê nivîskarê me gih nêr e, gih jî mê ye. Gih li mil e, gih jî li piştê ye!

Hespekî kalikê min hebû, hespekî rewanî. (r.164)

Em divê qedrê hespa xwe jî bigirin. (r.166)

Hespê M. Uzun gih nêr e, gih mê ye. Gih mihîn e, gih jî hespê kêşê ye!

Kirivê min Bênav...diyarê min kirî. (r.171)

Hevaltiya min û Bênavê wisan

dest pê kirî. (r.172)

Karika M. Uzun nêrûmê ye. Eger bû nêrîkî kever, nêr e. Lê ku bû bizineke kol, mê ye!


wekî her zîndanî, zîdanek bû. (r.183)

di zîdana gemarî, biçûk... (r.184)

Zîdana girtiyê me (ya nivîskar) gih nêr e, gih jî mê ye!

Demek, gava girtiyê me têde lêdanê dixwe, nêr e. Lê gava helbestan tê de dinivîse, mê ye!

(dûmahîk hejmara bê...)



Ji bo te

Lawaziya dengvedanê
Tengerêyên wêneyê
Min ber bi te ve radikişînin..

Şaneyên tarî li pey min in
Di çolistana aram û tar û mar de
Aso li nik te dihêwire..

Damarên min stiranine bî ne
Xwîna min sekirat e
Derz neman e
Neman jî bişaftina ji bo te ye..

Gorepanên demê bi mişextiyê
dagîrbûne
Bênderên aso bi bêrikirinê nixumîn
Meşextiyê hawara ji bo te herifand..

Xewn temenek bû di odayek jibîrkirî
de jibirbû
Temen leylanek bû..
Bi rengê avjîna katjimêra ji bo te xemilî

Birin deqek bû
Deq mîna çavkaniyekê herikî
çavkanî mîna jenê herikî
Bi xeniqandina ji bo te lerizî..

Maçê bişkojek himbêz kir
Bişkojê bi tîpine çelmisî ziman gerand
Bişkoj berya ku biweşe sirûdên
ji bo te neqîşandî, bû..
Berya ku tu derbasî bazbendê bibî
Tu nimêj bûyî û wexta tu derbas bûyî
Nimêj ji bo te nalîneke bêdeng bû..

Çurîskek winda bû, çav winda bûn
Gulgenimên seqemê bendewariya
stêrkan kirin
Û bendewarî jî bêrikirin e ji bo te..

Di navbera peyvê û wêneyê de
Neynikew rewrewkî ye
Peyv qurmiçî
Wêneyê xwe kuşt û ne-sercetayiyê
Kutayiyê her bi te ve radikişîne.



Rindê Çeçan

Dengbêj

Mihemed Efif Huseynî



Apê min dimire û ji mirinê radibe. Bêyî wî ode bîntengtir e, di sîber û bêdengiyê de dixeniqe, bêriya wî û çavli rêmana vegera wî dike. Ew jî dilê wê nahêle.

Odeyeke di dudilî û di raperîna apê min de dijî, zerikên sifirî neqisandî, refên kin ên pirtûkên bêdeng, kulekên ku pencere ne, ku tarîbûna hundir ser bi keviyê de dirijînin û ber bi coka çiminto yî zirav a ava apê min û nêrbûna wî yî ku pêdiviyî pesindanê ye, diherike. Perdeyên keskîn û Qunsilê Mehabad, xebata rojane ya li ser destnivîsê, hewldana jidil ku bi dengê dengbêjekî kevnar bistirê. Dengbêjekî kor e di gulistanên tarî yên çavê xwe de windayî ye, çawa dikare ewqasî bistirê, ma ne kor e?

Defek bi zencîrên zîvînî daliqandiye, meyeke kevnar ji bîranînên apan û lawên wan ku her êvar li dora wan dibûn xekek, tevnek ji tîpan, li xwe mîkur dihatin li ser pîrekên ji gundên dûr dipeyivîn, hine ji bakur hatiye şandin û tama tûtina nû gihaştî, û rûniştekek piçûk ji xêzeranê ji bo pirtûka ebedî ya Apê min a li ser balendeyan.. Hersê balendeyan:

-Tawis şahê me ye, serdarê periyên û mîrê behîstê ye.

-Kew ji netebatê ji dayik bûye, Kew ber bi hemî rexan ve dehfdayî ye .

-Birîndar şêxê miriyên û berpîrsê xewnan û rengê reş ê ku aso dînumîne.

-De ka hela ji vê tûtînê jî bipêç lo!

Sado qutiya xwe ji Apê min re davêje, na navêje lê dihêle ku bi aramî bişemite û li ser keviya kulavê qalind raweste.

Evar li ser êvarê kom dibe, gumanek; leşkeran hişyar dike, pencereyek bi ser bakur de vekirîye..

-Pêjna lingan tê Cegerxwîn!

Di çend kêlikan de destnivîs têt veşartin ..çiya her tiştî dibînin, gav bi dû gavê de, û bayek di banga Apê min de dixeniqe, berya ku vegere, careke di qiyameta wî ye, Besnê û balendeyên wî dizanin, û gîhayê bi tof ên li ser qiraxên Amûdê, kulîlkên havînê ji dizanin, û kuştî û şehîdên Sînemê jî, û peykelê wan ê li bexçeyê kavilbûyî, bexçeyê ku bi matmayîna êşa xwe rapêçayîye.Hespên dûr bi dijarî dihîrin, piştî xwe ji tevzînokekê re diçemînin. Bûnewerekî ji nehneh û bobelatê, tev dizanin ku dê ji mirina xwe careke di rabe, piçekî ji erdê bilind dibe, bi miriyên ku beriya wî ji serdemên dûr ve mirine dipeyive,, vê carê gazin ji Mîrê pêşîn dikir, Mîrê ku beriya 154 salan miribû, çima serkêşiya leşkeran ji kuramê xwe re hiştibû, kur amê ku ew û zilamên wî xapandin, ku çiyên xapand, ku çek û barûd ji dijmanan re hiştin, pişt re kilîta kelehê ji radestî wan kir, kilîta ku

kêferata dawîn ya bajarekî ji qiyametê, ji karbanan û ji goristanên ku zivistanê di avê de dixeniqîn, dixeniqîn, pertel û jibîrkin serav dibûn li Cizîrê.

Dê piştî katjimêrekê vegere. Pêşi dê riya xwe bi Cegerxwîn xîne.

Birîndar xwe çem dike, cûre destê xwe li karûbarê xwe sivik dike, bi hêminî perde dihejin, xewa di germa havînê de ya li nik wî têt bîra min, û qiçîna tava ku bi xênî ve sêrêz bûye ji.

-Apo, Apo ma gelo te destnivîs ligel xwe aniye?

Çarçewên zêrkirî, nezaniya textê dergeh, asîtank a xênî, elboma wêneyan, sindoqên piçûk ên ji textê pîrozmend, cegerdariya demê di tarîbûna cûreyê de, Ji nişkê ve cûre ronî dibe, tiliyên pir ên mişt tûtîn diteqin, bi navê wî valahî pitepitê dike û Besnê gelek tiştan dizane, lê ligel kevza şîn di avgirê de veşartine, renga beqek piçûk xwe ji heriyê ber bi merdiya avê de çem bike.

-Ev qurmiçî ji kuderê hat?

-Evaya pîvana sazdar e, pîvana sifirê Amûdê ye. Besnê razên xwe bi ser bakur de dirijîne û bixêrhatinê dide zilaman.. Apan.. Mîr.. Cegerxwîn.

-Ez Beqê ji destê xwe bernadim, çinkî kesek e, wek riha Apê min kesek e.

-Min hevaleyê ji bo Birîndar aniye.

Balende li Apê min temaşe dike, pişt re berê xwe dide

Beqê.. wê dinukulîne, dengê pirtepirta baskan ji cûreyê têt bihîstin.. Dengêkî tîr, xwe li binguhê bayekî germ dixîne, bayek ji mûzîka Şêx Seîd ê ku di wê kêlikê de bi dengbêjê kor diramiya, ku çawan dê li ba Qunsil bi navê Kurdistanê amade bibe.

Ji nişkê ve mala me bi çewalan hat dagirtin.. Bi wan çewalên nûranî.. Qineb di bîna xwe de merd e, bi kulîlka kindirê mijûl e.

Ez derbasî odeya mezin dibim linik çewalan tevliheviya xwe belav dikim

Qineb.. Qineb; qehwerengiyê vekirî, xêza sor.. Tevnekarê xemgîn, tevnekarê ku li ser tundiya werîsan poşman bûye..

-Apê Sa'do wêrana xwe ji min re bihêl!

Di hingora yekemîn de hespên ku bi tûtîn û çekan barkirî ne vedimirin.. ji matmayînê ber bi çewalên qinebî de diherikin.

-Tu ala mezin ji bîr nekî?

Wê rojê, nîvro, sal 1946 bû, Qazî Mihemed derbas dibû, kirasê xwe li ba dikir û netebatiya xwe bi ser zilaman de dirijand:

Generalê pêşîn, berdevkê komarê, guftûgokar, konsul, û ewê nediyar, du çav bi asoya xwînewî ve girêdayîne, bi ser sirûdê ve û bi ser xwendina kulîlkên zer ve girtîne:

-Çima tenê yên zer?

-Çinkî Şîniya kurdan in.

Şêrînê!! Hey Şêrîna bax û bîstanan pêwîste tu xuşka min a mirî ji bîr nekî, pêwîste tu alê ji bîr nekî!

Sed sal di ser wê rojê re; di ser wê nîverojê re derbas bû, lê hêjî bîna çewalan ji alê difûre; bîneke piçûk; rastîn, rimak, sîgirtî, çavliremayî, le-

zok, bi tenha ,hergav bitenha.. Bîna cihê poşmaniyê û ciwaniya Qazî Mihemed li ber sêdarê.

Skandînaviya!!

Skandînaviya!! Berf ji hundir ve dibare, baran; kelehên sifirînî bi bêzariyê direşîne, li seranserî sala çûyî ez çavdêriya katjimêra mezin a li ser kelehê dikim, salek ji çavdêrî û revakirinê, cîgeh bi hestên xwe yên req... Kevirekî reş, mermera Italyayê, kêlên goristanan, Şivên hesinî yên Tiramwaya Gotborgê, bizava kevanî ya nerm a wê jina ku himehima kevokan dide hev...

Damyana!

Şêrîn!

-Kê ev keleha ku bi nimêj û nalînan nixumandiye avakiriye?

Tevnekarê pêşîn ê çewalên qinebînî ye. Bi barûda tîr û bi kolanên Mehabadê mişt dibe û bi gumanan jî.

Wê nîverojê, Qazî derbasî enbara çewalan bû, li tevnekar temaşe kir, çavdêriya boyaxçiyê yekemîn kir, xwe bi wan re westand, ew danî ser masê; hinek jê bi rengên xuristiyane boyax kir. Kesk-Zer-Sor.

-Kêfa min ji vî keskî re nayê.. Ev keskaya di rengê gelaciyane de ye!

Roja dîtir; dîsa nîveroj bû, bîna gelaciyane ji ser banên Mehabadê difûriya, Qazî Mihemed girtibûn, leşker li hawirdora wî; ber bi kulîkên kindirê ve diçû, leşkerekî dikir kurtepişt:

-Xwedayo! ji bo çi bîna qineban jê difûre?


Skandînaviya!

Welatê burc û kelehan, welatê tevnekarên bêzariyê, Skandînaviya hey bîna Şêrîn a mirî, neqşên mizgeftê li jor in û bîna çewalên zer. Ew bîna ku piştî gelek salan ji nexweşiya sifirînî hişyar kirim.

Hêlan bi werîsên xwe ve li jor e. Şêrîn difire.. bilind...bilind.

Li derve berf dibare.

Li vir...Li wir çewal dúbare dibin, lê vê carê bi cendekan mişt dibin; bi bîna dijwar a Qazî Mihemed.





Dîlokeke mezin bo John Donne

John Donne serê xwe daniye,
 li dorhêla wî hemî tiştan serên xwe danîne,
 dîwaran, erdê, çerçefan, wênayan,
 masê, berran, xilqên dergehyan, çengelê cilan,
 nemliyê, mûman û perdeyan
 tev mirin, şûşe, perdax, zerik, nan, kêra nên,
 qir û qafên ferfûrî, kirîstal, lalî.
 çira razanê, çekşo, cam, katjimêr
 pileyên mêrdewanê, hemû dergeh...Şev li her cihî ye,
 Li her cihî şev e, li koşeyan, di çavan de, di cilûbergan de,
 di nav belgan de, li ser maseya nivîsandinê, di peyivîna rewanbêj de,
 di bêjeyên peyivîna de, di êzingan de,
 di maşika komirê de, di komira sopeya vemirtî de, di hemî tiştan de
 Di paltoyan de, di pêlavan de, di goreyan de, di sîberan de,
 li paş neynikan, di nav livînan de, li paş rûniştekan,
 û careke dî di zerikan de, di xaçan de, di çerçefan de.
 Di bermalkên li ber dergeh de, di tiragan de, hemî tişt mirin.

Hemî tişt mirin, pencere, berfa li ser pencerê,
 Banên hevml bi nişîvên sipî, gupîtkên wan mîna çerçefa xwarinê ne,
 Hemî xelkên taxê mirin, çarçeweyên şikestî yên pencereyan mirîne.
 Pirên kevanî, dîwar, pencere, hemû mirin.
 Kolan, rehên dolabên textîni, şîşên hesinî, û guldank,
 ne ronahiyek diçuruse, ne jî zîqezîqa dolaban, sûr, neqîş, zencîr, sing,
 Dergeh mirine, gustîlk, dest, xilq, zeqate, kilît û destik,
 ne kurtepîst û ne xuşexuş û ne jî teqiteq tîn bihîstin,
 ji bilî qirçeqirça qeşê tu tişt nîn e, giş mirine û berbang dûr e
 Girtîxaneyan, keleşan serê xwe danîn...herwisa
 hemî alavên firoşgeha masiyan jî serên xwe danîn
 Termên berazan serê xwe danîn, xaniyan, pişta xaniyan û
 segên bejî serên xwe danîn.
 Di veşartgehan de pisîkan bi guhine hestdar
 serên xwe danîn.
 Mişk mirin, xelk, London jî.
 Li bendergehê kelekeke bayî serê xwe daniye, av û
 berfa ku di zikê xwe de dinale ber bi dûr ve radikişê
 li tevî esmanê mirî dibe.
 John Donne mir, derya jî pê re mir,
 Perava kedanî serê xwe danî, li ber keviya deryayê
 hemî dorav bi mirinê himbêzkirî serê xwe danîn.
 û her beşçeyek bi sê xilqan dihat asêkirin,
 reşedarê û sipîndarê, narewanê, kajê serên xwe danîn,
 nişîvên çiya, rûbarên li ser nişivan,
 tengerêyên çiya serên xwe danîn,
 herweha roviyan, guran û hirçan, li ser nivînan serên xwe danîn,
 lê wê gavê ziryana berfê devê kunan digirt
 Balende mirin, fixan û çiveçiv rawestiyân,
 Qixeqixa qiralkan nema tê bihîstin, û kenê kund jî,
 Asoya Ingilîzî bédeng e, stêrkek çirusî, lê
 mişk çû kiniştê da ku xwe jî gunehên xwe bişo.
 Hemî tiştan serê xwe danîn, di gorên xwe de hemî
 miriyan serê xwe danîn; bi hêminî.
 û li ser textan zindiyan di derya gumlekên xwe de serî danîn,
 yeka yeka, di xewê de binavbûyî bi tirs serê xwe danîn.
 Hemî tişt mirin, çem, çiya, daristan,
 Lawir, balinde, cîhana bêcan û zindî,
 Ji bilî berfa ku ji nav pencên şevê dibare nîn e;
 berfa ku dê li ser seriyan serê xwe deyne.
 Firişteyan, pakpeyayan serên xwe danîn û
 ev cîhana mişt metirsî di nav destê şerma pîrozmend de hiştin.
 Dojeh û behîsta ronak jî serên xwe danîn,
 Di wek vê kêlikê de; tu kes nîn e; ku anuha li mala xwe
 serê xwe danayine.
 Yezdan jî serê xwe danî, anuha zemîn biyan e
 çav nabînin, guh nabihîzin,

Şeytan jî serê xwe danî û ligel wî zikreşiyê
 serê xwe danî ser berfa bexçeyên Ingiltirayê.
 Siwaran serên xwe danîn, firîşteyê û qeyameta xwe jî,
 hespan serên xwe danîn, di xewê de dibezin,
 û hetanî refên periyên ên ku hevdû himbêzkirine,
 li jêr quba kinişta Pols serên xwe danîn.
 John Donne serê xwe danî, çameyan, wêneyan,
 beşavendan jî ligel, çi xurt û çi lawaz winda bûn.
 Lêbelê çêr û sixêf, bêrîkirin, gunehkarî, hemiyân,
 di hundurê tîpên bêjeyên xwe de serî danîn.
 Her çameyek ji bo ya dî wek xuşkekê bû,
 Di gel ku di navbera xwe de kurtepiştê dikin jî,
 lê her yek piçekî diheje, ji dergêhen esman dûr in, hejar in,
 tîr in, zelal in, bi hevgirtinê dagirtî ne.
 bi kûrbûn xêz serên xwe datînin, û "yambo" jî bi xurtî dinepixin,
 û "tirakîyan" serên xwe li ser herdû aliyan wek pasvanan şîpya danîn,
 û di wan de xewnên jibîrkirinê serên xwe danîn.
 û li paş wan tiştêkî dîtir bi kûrbûn serê xwe danî...payedarî ye.
 Hemî derdan û renckêşanan serên xwe danîn,
 çêran serê xwe danî, çakî û ziyane hevdû himbêzkirin
 Pêximberan serên xwe danîn,
 û sûlava berfê li pangaveke reş î piçûk
 di firehiya cih de digere.
 Hemiyân serî danîn, û
 xirecira pirtûkan jî serî danî,
 rûbarên ji gotinê yên ku bi berfa jibîrkirinê hatine nixumandin
 serên xwe danîn,
 hemî zimanan û hemî rastiyên ku
 di xwe de dihêwirînin serî danîn,
 zencîrên ku wan bi hevdû ve girêdidin serî danîn û
 hêdî hêdî xelekên wan sist dibin.
 hemiyân di pêşbirka kûr de;çakpeyayan û şeytan û yezdan
 serên xwe danîn.
 Hemî zebeniyên dogehê, şagirtên Îsa,
 zarokên wan, ji bilî berfa ku bi ser
 tariya kolanê de dibare tu pêjin ji vê gerdûna berfireh nayê bihîstin.
 û çi jî...! Ma deng tê te..
 li wir, di taristana sar de mirovek digirî, bi tirs kurtepiştê dike
 li wir kesek heye li ber dilovaniya perçebûna xwe maye,
 digirî... li wir di taristanê de yek heye.
 Dengêkî zirav, zirav wek derziyê
 bê tta, bi tenha xwe di bin berfê de maye, li her cihî seqem e.
 wek derziyê ye, derziya ku şîya ji serê şevê ta berbangê bidirû...û
 di çeşnê vê bilindahiyê de..!
 Ew kî ye li wir kûrekûrê dike?
 Ev tu yî ey periya min, tu li hêviya vegeerê yî, di bin berfê de,
 wek havîna ku çavlirêmana vegera evîna min dike?

Ma di tariya şevê de tu yê biçî malê?..bersiv nîn e..
Ma gelo ev hûn in ey firîşteyên min?Vê stiranbêjiya komeleyî
ya xemgîn komika jinên dilokbêj anî bira min,
Hûn ey mirîno ma we biryar daye
ku hûn êdî ji nişkêve dê ji kinişta min derkevin, ma ew hûn in? Ma ew
hûn in?...Bêdengî .

Pols ma ev tu yî? Diyare ku ji ber peyvîna serhişk dengê te qalind bûye,
ma ewê ku serê xwe yî sipî di taristana zîz de, li wir, bi giryan
xistiye ber xwe de tu yî ?i.. Ji bilî dengvedana bêdengiyê tu tişt nîn e.
Ma gelo ev e destê ku dîdarî veşartîye.. Destê mîna çiraxekê ku li wir
hemî cihan ronî dike?Ev tu yî ey berêz?Renge ramanên min dirindane bin
lê kûrekûra giryanê bilindtir dibe, bêdengî...aramî.
Ma ev tu yî yê ku li Bûqê xistiye ey Cibrîl... Ma gelo yê ku li wir bi bilin-
dahî bireyê dê kî be?

Ma gelo min bi tenê çavên xwe vekirine di wê wexta ku xweşmêran hes-
pên xwe amade dikirin.

Di bin lepa taristana hêzdar de, tevan, bi kûrbûn serên xwe danîne,
û gerok nêzîkahiye li xirecira şevê dikin, ev tu yî ey Cibrîl, wisa ligel Bûqa
xwe bi tenha serê xwe di vê tarîtiyê de di çelê zivistanê de, digirî.

Na.. ev ez im, John Donne, ez giyanê te me, li bilindahiya esmanan
şîniyekê li dar dixînim çinkî min bi dahênana xwe raman û hestên giran
wek merbendê, afirandine.

û tu, bi vî barê giran tu şiyayî di nav rengekêşan û gunehan de bifirî..

Na herê tu bi jortir de firiyayî

tu balendeyek bûyî lewra te gela xwe didît,

li ser hemî waran û li ser hemî banan te xwe li ba dikir.

te hemî derya dîtin, hemî dûrê zar,

te ziq li dojeha hinavên xwe temaşe dikir, te dojeh di şiyariyê de dîtibû

wek ku çawan te bi zelalî behîşt dîtiye, wek ku çawan di zortirîn
çarçewên şîniyê de,

Te hebûn wek dorava xwe didît, te li vê oqyanosa bêmînak temaşe dikir,

her çar rex bi taristanê nixumandîne...tarî û giryan e

te bera dû Yezdan bi xwe dabû û tu bi şûn de vegeryayî.

Lê ev barê giran astengan ji bo xwelibakirina te durust dikin,

ku ev cîhan sed burc û rûbarên wek werîsan e, ku mirov li jêr temaş bike
hetanî roja qiyametê jî ne ewqasî bi metirsî dixuye...!

û ji welatê ku seqa lê nayê guhertin

her tişt wek xewneke pûç dixuye, ji wir Xwedan wek çirîskek ronahiya
ku ji pencereya mala dawîn a ku di mîja şevê de xeniqiye, tê, dixuye.

li wir bexçe raxistîne ku yekcar halet nehingivîne wan...

ne hema ji çend salan ve lê ji sedsalan ve, li wir ji bilî daristanan nîn in ku
mîna sûrên xwaromaro rawestyayîne,

û li ser gîhayên bilind ji bilî baranê semageriyê nake.

û li wir, hespê zirav ê êzingvan , sergerdan e, di nav teraşan de dibeze,ji
nişkê ve yê êzingvan, piştî ku hildiperike dara kajê, agir di rûbar de dibîne,
li wir li dûr.

her tişt...Her tişt dûr e, li vir jî navçe nenas in
û awira rewan hildiperike banên dûr,
livir ronahiyeke dijwar heye,
li vir mirov reyandina segan nabihîse,
na û ne jî zingîna zengilan dibihîse.
Lê wê bizanibe ku her tişt dûr e
û bilez dê hespê xwe ber bi daristanê ve bilezîne
û li vir û li vir, reşme, Erebanî qeşê, şev, ew bi xwe jî,
û hespê hejar dê bibin xewnek ji xewnên Incîlê.
û wisa va ez digirîm, digirîm...
rêçek nîn e, qedera min e ku ez li keviran vegerim,
çinkî vegera wek balendeyekî li min qedexekirine, qedera min e ku ez
tenê mirî vegerim wir.

Erê...Erê , bitenha, piştî jibîrkirina te
ey cîhana min a li ser erdê, a hêwî û jibîrbûyî, da ku jibermayên arezûyan
bi êşdarî avjeniyê di te de bikin, da ku di wexta avjeniyê de bi xatirxwestinê
re dilovan be.

Guhdar be...Wexta ku min bi giriyê xwe aramiya te tevlihev dikir
berfeke zelal di taristana zîz de dibariya, kûrekûr
ber bi dilovaniya jihevcihêbûna min û te ve radida
lê derzî bi bizaveke jîr bi pêş de û bi paş de difire.
Ne ez... lê tu yî ey John Donne, tu kûrekûrê dikî, tu bi tenha xwe serî
datîni, û lalî jî di nemliyê de serên xwe datînin,
madam berf bi ser xaniyê mirî de dibare,
madam berf ji wir bi ser taristanê de dibare.
Wek balendeyê ku di hêlîna xwe de dihêwire,
ku xwedî rêçên zelal e, xewnên jiyanek birûmet e, ku hetaheta
bi stêrkên li paş ewran veşartî bawer e,
wek balendeyekî, giyanekî pak,
digel ku rêçên zemînî mişt gunchkarî ne jî
ji hêlînên qijalkan ên li ser xaniyên reşêlkeyên xwelîrengî yên vikîvala
sadetir e.

Ewê di çêşnê balende de, sibehan şiyar dibe,
anuha di bin cawê sipî de serî datîne,
madam berf û xewn qonaxa di navbera giyan û laşê wî yê mirî de dirêsin.
Hemî tiştan serî danîn, lê belê du-sê
helbest bendewariya bidawîanîne dikin;
bi tinazî, bi devên xwe yên bêdiran,
evîna laşî wek erka dengbêjê ye
lê evîna giyanî wek sifra keşe ye.
Kevirê êş yê bi dîwarên ji avê
di her carê de dê heman tovan bihêre
eger hinekan hevpariya jiyanê bi me re kir..Dê kî
hevpariya mirinê bi me re bike?
çarî biqul e, yê ku bixwaze wê ber bi
hemî dawîyan de radikişîne,
diçe, carake dî dizîvire, careke dî radikişîne.

ji bilî quba esman nîn e ku carina di
 taristana zîz de ristina derziyê distîne.
 De serê xwe deyne..De serê xwe deyne ey John Donne..serê xwe deyn û
 ji xwe bawer neke,
 palto biqul e...biqul e, li wir
 li ser çengel daliqandî ye
 lê temaşe bik...! û di nav ewran re li stêrka xwe
 ya ku di wan hemî salan de pasvaniya cîhana te fikir biger.

 -Brodskî: Di sala 1940 î de li Lîningrad ji dayik bûye. sala 1972 an ji kevne-
 sovyetê hatibû bidûrxistin.. Anuha li Emerîkayê diji. Sala 1987 an xelata Nobel
 a edebiyatê wergirtiye.Bi zimanê rûsî û ingilîzî dinivîsîne, û gelek pirtûkên wî bi
 wan herdû zimanan hatine weşandin û wergerandin.

-John Donne (1572-1631): Helbestvanekî Îngilîzî pir bi nav û deng e, gelek
 helbestên dirêj wek rêça giyan û şirovekirina cîhanê nivîsandine. Damezirênerê
 dibistana mîtafizîkî di helbesta ingilîzî de ye.

-Yambo û Terakî du ritmên helbestî ne.

Wergerandina
 Ehmed Huseynî



Palto

Nikolay Vasîlyevîç Gogol*



Carekê li bîroyekê li Petrogragê nivîskarek hebû, ew mirovekî hûrik bû, rengê pora wî bi sore ve bû û xwiya dikir ku dîtina çavên wî gelekî kêma e. Ew nivîskarekî ji pêpelûka nehan bû, ew weke wan kesên ku di çîrokên de bi wan tê dikenîn bû. Navê wî Akakî Akêkîvîç bû. Ti kesî nizanîbû, ka kê alîkariya wî kiribû, da ku karîbû bikevê ser vî karî de û yan jî kengî wî li vê bîroyê dest bi kar kiribû. Serkar wî û nivîskarên din diçûn û di hatin, lê ew her dem li yek cihî bû û yek kar dikir. Ev kar jî kopîkirin bû.

Xelkê êdî behwer kiribû ku ew bi vî rengî û bi wî paltoyê xweyî kevn ve hatiye ser rûyê dinyayê. Roj derbas diûn bêyî ku kesek guh bidiyê, ta bi deregevanê li ber derî jî. Deregevan ti caran ji ber nedirabû û carnana silava wî jî nedivegerand. Serkarên wî ti caran rû nedidanê û bi quretî pê re dipeyivîn. Serekê nivîskaran ji bona nivîsandinê pelik didanê, lê bêyî ku ew li rûyê wî meyzênê, wî kar tavête ser masê, bêyî ku kesî zanî bû dide kê? Lê Akakî bêdeng dirabû û dest bi kar dikir.

Nivîskarên xort, yên li bîroyê kardikirin kenê xwe bi Akakî dikirin. Çîrok li ser çêdikirin û ji pêş ve ji hev re digotin:

Xwedîya xaniyê wî ya heftê salî lê dixê û jê re dibêjê ma emê kengî hevdu bikin. Pelik di ser serê wî re hûr dikirin, weke ku berf were xwar. Lê wî ti caran deynedîkir. Ğ ku wî dev ji karê xwe berdida, ti kesî kêmbûn li cihê rûniştina wî nedidît. Carnan çaxê ku hevkarên wî ew gelekî têtşandin û nedihîştin ku ew karê xwe bikê, wî ji wan re digot:

Dev ji min berdin, ma win çî ji min divin? Win çîma win wîlo li min dîkin?

Dengê wî û gotinên wî dihiştin ku dilên wan pê bişewitê. Carekê xortekî nû hatibû li bîroyê kardikir, xwest ku weke herkesî pê bikenê, lê ji nişkê ve rawesta weke ku ji xewnekê şiyarbibe. Piştî hingî ew ti caran pê nedikenî û her dem ji xwe re digot:

Çîma mirov birayê xweyî mirov hevqasî têtşênê?

Gelekî zor e ku tu kesekî weke Akakî bibînî ku bi tenê ji bo karê xwe bijî û jê hez bikê. Karê wî cihana wî bû, wî cihaneke gelekî xweş di kopîkirinê de didît. Wî kêf, xweşî û şahî di nav tîpên alfabetê de didît. Rojekê serkarekî dilpaqij xwest ku Akakî bibê cihekî baştir û karekî çêtir bidiyê. Lê ev tişt gelekî li Akakî nexweş hat û wî got:

Ez dixwazim vegerim karê xweyî berê, kopîkirin ji bo min gelekî baş e.

Piştî wê yekê êdî kesekî nema lê pirsî û ew bi tenê ji kopîkirinê re hiştin. Akakî ti caran guh nedida cilan. Paltoyê wî dirêj, kevn û gemar bû. Çaxê di rê de diçû jî guh nedida titiştî û hay ji titiştî nedima. Toz û gemar bi ji penceran bi ser serê wî de dihate xwar, yan jî ku hespekî serê xweyî westayî danîbûna ser milê wî, dîse wî guh nedidayê û wî bi riya xwe de diçûbûna. Dawî ku ew digeha mala xwe dirabû bi lez cilên xwe di guhar-

tin û xwarina xwe dixwar. Akakî ti caran guh nedida xwarinê jî, rengê wê çilo be, xweş be ya ne xweş be, wî lê nedişkand. Carna mêş û gemar pê re dixwarin bêyî ku pê zanibe. Paşê ew diçû, pelikên ku bi xwe re ji bîroyê anîbûn kopî dikirin. Heke ti kar nebûna ewî ji xwe re ji kû bûna wî karekî derxe, lê divabû ku ew roja xwe bi kopîkirinê bibihûrênê. Wî nizanîbû ti mijûlayiyên din ji kopîkirinê pêve bike. Kesekî ew ti caran li şahiyekê nedidît. Lê dawiyê ew diçû nav livîna xwe û bidilxweşî li hêviya sibe dima, ka bê wê xwedê ji bo kopîkirinê çî jê re bişiyênê.

Ev bû jiyana Akakî. Ev kesê ku sala karê wî bi çar sed rûbilan bû, lê dîse jî ew pê qayil bû. Belkî jî ku jiyana wî mabûna ta dawiyê, lê zor û zehmetiyên jiyane li pêşiya wî bûn. Li Petrogradê dijminekî dijwar yê her kesê ku sala karê wî ji çar sed rûbilî nebêhtir bû hebû. Ew dijmin ne ti kes bû ji serma bakur pêve.

Her sibeh ji seet heşt ta seet neh rê ji karker û xwedî karan têne dagirtin. Serma di vî çaxî de bêhvilan nivîskarê belangaz dişewitênê ta ku nizanin bêhvilên xwe bixine kû de. Ew bi tenê karin xwe di nav paltoyên xwe de bipêçin û bi lez bazdine bîroyên xwe. Akakî pê dihesta, ku serma zor dide navmilên wî û li pişt û wî dixê, lê wî jî xwe di pirsî:

Ka ev tişt ji ber çî ye?

Çaxê paltoyê xwe danî ber xwe û baş lê meyzand, wî dît ku çend qul tê de çêbûne û ba bi serbestî di wan re diçe û tê. din zanî bû bê çima piştta wî wan sibehan ji serma dişewitê. Paşê, wî biryar da, ku paltoyê xwe bibe ba Pêtroviç, ew terziyê zeîfî bi çavekî. Lê Pêtroviç hê zanîbû cilên belengan bidrûyê û pînekê.

Akakî çû mala Pêtroviç. Bi rê de ji xwe re digot:

Gelo ewê dora çiqasî ji min bistênê?

Xwedê bike ku ew serxweş be ji bo gelek peran ji min nestênê?

Lê hêviya? Akakî ne di cihê xwe de bû. Pêtroviç neserxweş bû. Lê gelekî ne razî bû ji ber ku nikarî bû ta bi derziyê bike.

Akakî silav kir:- Roj baş!

Roj baş! Pêtroviç silava wî vegerand, û bi çavê xweyî yekane li tiştên di destê wî meyzand. Akakî nema zanî bû çî bêjê, lê got:- Pêtroviç, ez hatime. . . meyz. . . ev.

Pêtroviç zanî bû çî dive. Wî rahişte, palto vekir, lê meyzand. Pêtroviç serê xwe hejand û got:- Ev nema çêdibe; nema hêja ye ez pêre biwestim.

Dilê Akakî hate xwar û got:- Çima Pêtroviç? Meyzê, nav milan bi tenê qul bûye. . .

Lê Pêtroviç rê nedayê û gotvê ku ew nikare palto çêke, û dive yekî xweyî nû bidrûyê. Akakî ev tişt bihist û cihan li dora wî zivirî. Lê ji Pêtroviç pirsî, bê wê paltokî nû bi çiqasî çêbe?

Pêtroviç got:- Bi sed û pêncî rûbulî wê paltokî gelekî baş çêbe.

Akakî derket, derve weke ku di xew de bê, ew diçû û diçû lê nizanî bû diçe ku?

Bi xwe re di peyivî û di got:- Sed û pêncî. Ezê ji kû bênim? Lê çima. Ti cara palto ne hêja ye sed û pêncî rûblî. ğ wilo ji xwe re got û got. Lê dawî geha biryarekê ew jî ku paltoyekî xweyî nû bidrûyê. Lê ma pere ji kû bêne? Ev li ser şansê wî dimêne. Ku serekê bîroyê çil rûblî bidiyê wê gelekî

baş be. Ji ber ku çil rûbilên wî jî hene. Akakî di xwest gelek tiştan bi van peran bikire. Lê ji bo palto dive ku hemû planên xwe ji bîr bike.

Piştî vaqas salên kar Akakî çil rûbil bi tenê dabû hev. Vir de, wê de. . . dawî nêhta xwe lê anî ku palto bikire. Ji vê rojê pêve ti peran xerc neke. Xanî xwarina xwe kêmbike. Çaya êvaran nevexwe û mûmê bi şev pê-nexe. Wilo carekê çû ba Pêtroviç. Piştî bazareke dûr û dirêj li ser heştê rûbilî li hev hatin, û kengî Akakî pere bêtê ewê dest bi dirûtîne bike. Akakî ji wê rojê ve dihate malê ji dêl ku şiv bixwe xwe dirêj dikir û tanî ber çavên xwe kengî paltoyê xwe bêtê û li xwe ke. Li hêviya paltoyê xwe bû weke ku li hêviya hevalemî xweyî delal be.

Roj li pey rojê di çû û hê perê peyde nekiribû. Lê rojekê serkar çiyen de jê re û şêst rûbil danê. Ji ber ku karê wî her dem qenc bû. Akakî vegera malê bi şahî. Piştî rast çû ba Pêtroviç û pere danê. .

Sibehekê Pêtroviç palto anî mala Akakî. Wî hew dizanibû êdî çî bike? Ew roj, ji hemû rojên jiyana wî bi kêftir û xweştir bû.

Akakî palto li xwe kir û bi serbilindî çû bîroya xwe. Herkesî di zanibû ku Akakî paltoyekî nû li xwe kiriye. Pîrozî danê de û gotinê de divê ku ew vexwarinekê bide wan. Akakî nema zanibû çî bikê û çî bêjê, lê serekê nivîskaran gote wan:

Başê, win hemû îşev li ba min in. Emê ji bo paltoyê Akakî şahiyekê bikin.

Akakî bi dilşahî vegera malê, palto ji xwe kir yê kevn anî ber û ji xwe re kenî. Li paltoyê xwe dimezand. Ew roj ya pêşî bû ku titişt kopî nekiribû. varê Akakî rabû, paltoyê xwe li xwe kir û derket, da herê mala serekê nivîskaran. Bi rê de Akakî li dora xwe dimezand û piştî xwe rast kir û bi riya xwe de çû. Dawî geha xaniyê serkar, ku li cihekî xweş bû. Xaniyekî xweş û mezin bû. Qelebalix ji oda rûniştinê dihat. Derî jê re vekirin. Paltoyê xwe jêkir û danî. Nema zanibû çî bikê. Lê wan zû ew dîtî û hatine pêşiya wî, lê ew zû jî ji bîr kirin û çûn bi pelikan leyistin. Akakî nêzikî wan rûnişt, li wan di meyzand. Lê piştî kêlikekê westa û xwest herê malê. Wan nehişt û şampanya jê re anîn. Akakî piştî vexwarinê dilxweş bû, lê dişe bê deng derket da herê malê. Akakî bi dilxweşî diçû. Li jinên xweşik dinerî û ji xwe re dikenî, ta geha tarika xweyî belengaz. Rê vala bûn, kesek li wan deran xuya nedikir û çend çirayên rehnîkê didane wê ferehiya di nav xaniyan de. Berf li ser rê bû û dinya gelekî sar bû. Ji nişka ve kêf û şahiya wî çû. Li dora xwe meyzand ji berfê û xaniyê tarî pêve titişt nedît. Çavên xwe girtin da wan hew bibinê. Lê dişe xwest ku çavên xwe veke, da meyzênê ka hê xaniyê wî çiqasî dûr e. Wextê çavên xwe vekirin, du kesên bi simbêl û dirêj li pêşiya xwe dîtî. Wî baş nedidît, lê hema pê hisa ku kulmek li sînga wî ket. Kir ku hewarî kesekî bike, lê kulmeke din li devê wî ket. Kulma sîsiyan li ûrê wî dan. Li ser piştî xwe kete ser berfê û bêhiş ket. Kêlikek tê ve çû bi hişê xwe hat, li dora xwe meyzand ji berfê pêve nedît. Li xwe nerî dît ku paltoyê wî hetiyê dizîn. Bazda, hewar kire nobedaran. Kesekî lê ne-vegerand. Çû ba polîsan lê bîroya wan girtî bû. Çû mal, lê nikarî bû raze.

Roja din ew neçû kar xwe. Ew cara pêşî bû ku neçûbû kar. Çû ba polîs, lê wan guh nedanê. Akakî pê hisiya ku ti alîkariyê nadinê de, roja din çû karê xwe. Hemû gelekî xeyidîn û her yekî şîretek lê kir. Lê yekî gotvê:

Baştir ji her tiştî ew, ku tu çîroka xwe ji mirovekî bi qîmet û xwedî nav û

deng re bêjî. Akakî jî bi şîreta wan kir û çû cem mirovekî wilo. Ew nû zengîn bûbû û ew gelekî ketibû darî çavên xwe de. Ji wilo jî çaxê Akakîyê belengaz kete bîroya wî de bi dengekî tûj û bilind pêre peyivî. Hişt ku ew di cihê xwe de bi mêne û bilerize. Akakî nema zanîbû êdî çi bike, yan çi bêjê? Lê naskir êdî ku ew tişteki jêre nake. Bi kul û keser ji cem derket nema hay ji dora xwe ma. Dibin baranê de di sikakê ve diçû û wê şevê Akakî neraza.

Tayeke giran ew girt û piştî du rojan ew mir. Xwediyê xanî ew bir veşart.

Li Petrogragê jiyana digera weke ku tişteki nebûbê û weke ku Akakî ti caran nebû.

Mirovek mir, yekî ku kesekî ti caran guh nedabûyê. Ti xweşî û şahî nedibû. Paltoyê nû her tişt bû di jiyana wî de. Palto şahî xiste jiyana wî de, lê ew şahî gelekî kurt bû. Bakî zer hat û her tişt bi xwe re bir.

Nivîskarekî din hatibû bîroyê cihê Akakî. Ew ji Akakî dirêjtir bû, lêbelê karê wî ne rind bû wek yê berê. Akakî mir, lê ne ev e dawiya çîrokê, jiber ko têbayê wî piştî mirina wî hê çend rojan dijî. Divabû, ko Akakî bê deng ji vê dinyayê neçê. Çîrokin li nav Petrogragê digeran digotin, ko têbayek bi şev li ser pira Kalînkî digere. Ew têba wek nivîskarekî hûrik e û li paltokî digere. Paltoyên xelkê ji wan dike, êdî nema kes diwêrê diza bigrê ji tirs, ko ew têba be. Careke karkerekî bi herdû çavên xwe dît û naskir, ko ew Akakî ye, lê jê tirs û bazda. Têbayê wî li Petrogragê digera û tirs dikire dilê xelkê de. Piştî wî mirovê binavûdeng berda Akakî ew pir poşman bû û rûyê rebenê Akakî jiber çavan nedîçû. Şiyande pey Akakî, lê Akakî hingî miribû. Çaxê wî bihîst, ku ew reben mir weke, ko bakî zor lê bidê û bêhna wî biçikînê. Da ew vê çîrokê ji bîr bikê, rabû çû şevbuwêrkekê li cehkî şahiyê. Gelek kes li wir hebûn hemû zengîn û navdar bûn, şampanya vexwar û şev bi xweşî biwart. Dawî li paytona xwe siwarbû, gote paytonçî, da wî bibê mala hevalê wî. Ew şeva xweş tanî bîra xwe, lê ji nişkê ve mirovekî ew ji pişt ve girt. Lê nerî, dît mirovekî hûrik bi paltokî dirêj e. Ew Akakî bi xwe bû. Rûyê wî weke cawekî spî bû û dêhnê têba lê diket. Têba gotiyê, ko tu ketî nav destê min de. Te alîkariya min nekir, da ez paltoyê xwe bibînim. Te dengê xwe li min bilind kir, ez jî ezê paltoyê te bibim. Wî kir ko ji tirs bimirê û ji hingî pêde hew deng li tikesî kir û wek berê negot:

Tu dizanî tu bi kê re dipeyivî, tu dizanî ez kî me?

Hê jî xelkê behwer dikir, ko têba li tarikên Petrogragê bi şev digere. Lê vê carê ew têba ne hûrik bû, ew dirêj bû û simbêlên wî hebûn. Wî bazdida û di reşa şevê de winda dibû.

*Nikolay Vasilyevîç Gogol (1809-1852) nivîskarekî rûsî bi nav û deng e. Gogol gelek çîrok nivîsandine. Ji wan: çîrokên Petrogradî, Vladîmirê Pêpelûka Sisiyan, Revîzor, Canên Mirî, Palto û yên din. Çîrokên wî kenê di nav hêstiran de ne. Di salên temenê wî yên çilî de bîr û behweriyên kevneperest lê xwiyakirin, wek di çîroka Cihên Bijartî de û di nameyên wî de, yên ji dost û hevalên wî re. Komeke nivîskarên rûs yên bi nav û deng, yên rexnevanên reyalist li pey şopa Gogol çûn. Ew li Rûsya bi navê Dibistana xweristî hatibûn binavkirin.

Wergêr:
Narîna Haco

Valahiyeke sênckirî

Tengezarê Marînî

Bila
di bin sîka te de
rakeve.
Destê vî penaberî berde.
Bila bêje: Dîlbera min /Mêya min
rê bidiyê
xwe tazî dike.
Xak tî dihêwirîne
Ez û tu dibin
şahidê mirina asîman û rûzemînê
Birûskên windabûnê, tu direvînî.
Tu, yên mê didin pey te. Tu jî
tîpan tînî bîra xwe.
Mîna zarokekî/
bi dilê zarokekî
Qehfikên te, hinarkên
çêr radimîsin.
Bi tîlên xewneke niv sax û niv fetisî
wêneya Xecê bi kenar dikim
Li ber derfeşa Baxos kasê tazî dilorînim
Siyamend şûrê xwe, yê guh li zengelora kehniyê
diherhitîne
Ev mirine, cihê her kesî li ser xaka wê heye.
Ji ziwabûna çemê helbestê,
bişirînekê dihinêrim, A, bêya xwe digindirînim
Brokrostekî din, bi wê hovîtiyê rêka xwe çareser dike
Bi dostanî/ Bi sultanî dixwaze
tîpên me/ Laşên me
veke.
BROKROST:
Qunaxekê, qehpîtiya xwe/
pozbilindiya xwe
biçîne/ tê de bigere
li ber lingê mindal
keskesorê parçe parçe dikin.
Reng xwe vedidizin, li cihekî bê Dîktator digerin.

Tenê reş
Reş serî hildide/ xebxeb ji qirikê dertê.
Ev dem.
Ev ziman, ez li wan xwedî derdikevim
Helbesta min/ evîndara min
Em bi dilekî şikestî xwe azad dikin
Hemî tîp, ji bilî sî û yek tîpî me dax didin
careke din bang didim
Werin...werin
Hetîketiyên min diyar bikin
Zexeliya xwe jî li hember deynin
çi bikim...!?

Ez zanim, nêrgiz li ber hêsirên min şîn dibin
Ez zanim, zilindar e tama hîqehîqa wan
Agir: cihê hêsir biramîse, tu nesotînî
Nizanim, gelo ev xewn in yan jî serpêhatî ne...!?
Piştî min, dilop dilop bîranînan
dadixîne.
Libelib aso dikizire.
Girêgeh lêgerînekê/ bêdengiyê
pîroz dikin
spêdeke bêgazin
diparzinînin.
Laşekî min heye.
û tiştêkî din jî heye...
Tevan ji we re dihêlim
Ez û tîpên xwe. em ê di dengê mêkewekê de,
melevaniyê bikin

15/09/1994

Newafo

Nîzar Agirî

Tu kes dê ji bir neke. Dema ez ji we re bibêjim, her kesê ku di wê sibe-hê de ew dîmen dîtibe dê tu cara jibîrneke gerek hûn ji min bawer bikin; renge hetanî roja dawîn ji jiyana xwe jî. Ne hema tenê kesên ku bi çavên serê xwe dîtibûn lê hemû xelkên bajêr, Hetanî ew xelkên ku di sibeha wê rojê de li ser eniya wan nehatibû nivîsandin ku li Erasa bajêr peyda bibin jî dê ji bir nekin; Erasa ku hergav mişt sidoqên şînkayiyê û çewalên hejîran û genim e, mişt teneke û çerm û erebanên textîni û rêxa dewaran e.

Erê, hemû xelkên bajêr, ji xwe wek ku hûn dizanin bajar piçûk e, mane tiştên herî balkêş tê de Sînemeya zivistanî ye, û kolana cilûcaw e û Erase ye, erasa ku bi ser rexê bakur de vekiriye, ku çiyayên bilind û pira mezin û qereqola ebedî xwe ji bo temaşevanan li ba dikin, ji xwe hema ku tiştê li rexê rojavayî bajêr li alî leşkergehê biqewime, di cih de, nûçe digihêje rexê rojhilatî bajêr alî Mîrayê, wisa mirov dibê qey hemû xanî bi kunine nediyar di dîwarên xwe de bi hevûdû ve hatine girêdan.

Lê çi qewimî bû? Bêguman hûn dipirsin. Ax! Wexta ku ez ji kolana êş ber bi Erasê ve çûm, wek hergav deng bilind, tevlihev dibûn. Elîko bi hêrseke dijwar bangî rêwiyar dikir da ku li sebz û şînkayiyên wî yên ku ji gundê KERENGO hatine temaşe bikin. Çeta jî sûndên mezin dixwarin ku hê tu kesî di dunyayê de ji Kebabên wî xweştir çenekiriye. Sofî Gundoro jî bi xêliyan, bi kevneperçeyên entîke barkirî bû, devê xwe yê bê diran vedikir û bi dengê ketî li zarokekî windayî dipirsî,

Dema ku min nêzikayî li nangeha Selîmo kir, min xelkên ku di nivê kolana de bihevûdû dehidan mîna xelegekê çêkiribûn û li hevûdû kom bûbûn, dît; carina dengê kenê wan bilind dibû û carina jî dengê dijwar dengê kenê wan dibirri; tev pê dihatin nixumandin, piştî wê dîsa dengê ken bilind dibû.

Ax! Min ji xwe re got, kuro ev Newafê dîn e. Min bilez berê xwe da koma xelkê. Min serê xwe bi kotekî di bin çengê yekî re derbas kir û min li hundirê xekekê nêrî. Newafo di nivê xekekê de bi cilûbergên xwe yên nas-kirî rawestyayî ye: Taximekî leşkerî bê qusûr. Şerwal û gumlek û kumekî bi qertel û li ser milan stêrkên zêrînî û li ser sîngê nîşan û xelat û alên rengînî. Lê vê carê ne wek ku ez wî nasdikim, ne kêfxweş bû; nedikeniya. Li dora xwe dizivirî, gêjo- mêjo dibû, tif dikir, kumê leşkerî li ser serê xwe diediland. Ji xwe Newafo carekê bi vî taximê leşkerî serokê nû yê belediyê xapandibû.

Ji serok weye ku Newafo serleşkerê mezin e lewra bi rêzgirtin rawestîya û silavek leşkeriyane pêşkêşî wî kir, lê dema ku kenê rêwiyar bihîst

şaşîtiya xwe naskir li turimbêla xwe siwar bû û ji ber çavan winda bû. Newafo jî bi serbilindahî; bi devekî vekirî û bi bişîrîneke pan rêça xwe berde-wam kir.

Lê anuha ne kêfxweş e, rûyê wî bêzar û tîrş e, çavên wî xemgîn in, ve-mirtî ne. Pitepita wî bû. Destê xwe bilind dikir û ji nişkê ve diqîriya:

-Wa tîn, wa tîn!

Sînga xwe dabû ber kulman, hetanî ku jê dihat lingên xwe li erdê dixistin, radiperiya, kef bi deva diket û digot:

-Tirsonekino dê bera we din, dê bera we din!

Tûyî hemî rexan dikir, destên xwe mîna ku dê bifire dirêj dikirin, û bi harbûn di xelesa teng de li dora xwe dizivirî, hin dikenyan, hinan jî bi pey-vên ne zelal kurtepişt dikirin.

-Dîno bêdeng bibe, kuro dê te bikujin lao!, yekî got:

Lê Newafo lerizî, li ber pêlên ingirandinê hejîya û bi sergêjahî digot:

-Kî dê min bikuje, kî dê min bikuje?

Roj ber bi nivro de diçû, hêdî hêdî dilopên baranê dest pê dikirin, xelkê xwe ji boyî çûnê amade dikirin, herweha xelkê gundan jî bi hêminî di vege-ra xwe de diramiyan.

-Newafo, birev kuro waye polîs hatin.

Me hemîyan bi hev re serê xwe bilind kir û me li alî kolana Belediyê temaşe kir. Hêdî hêdî turimbêla reş ber bi me ve dihat. Yeko yeko me xwe jî xelekê vedizî û me xwe li her sê çar rexan belav kir, li koşeyan, li ber dergehên firoşgehan em bi cî bûn.

-Ez birevim!? Ez birevim!?

Bi tenha serê xwe, wek dareke rût, di kolanê de li ba dibû, kef li dora lê-vên wî kom dibû. pitepita wî ranediwestiya, digot:

-Wa tîn, wa tîn, Xemir. . Xemir!!(1)

Turimbêl rawestiya û du polîs jê peya bûn. Yekî ji wan bi NEWAFO girt, bi hêz wî dehfa, ket erdê. Yê din werîsekî dirêj anî, lingên NEWAFO girê-dan, û werîs avêtin dawîya Turimbêlê.

Turimbêlê jî berê xwe da rexê qereqola belediyê.

Kî dê dengê Newafo ji bîr bike; dengê tûj, jihevketî, dengê birîndar, kî dê terpirepa wî ya li ser erda wê kolanê bi dû turimbêla ku bi bêagahî ew dikişkişand, ji bîr bike!?

Kî dê wê matmayîna req a ku bi ser rûyê xelkê de dabûbû; xelkên ku li koşeyan rawestiyabûn û bi bêdengî çavdêriya bûyerê dikirin, ji bîr bike!?

(1): Xemir: Ereben ku di sala 1973'an de li Kurdistana Suriyê hatin bi cih-kirin.

NAAA!!!

Ehmed Huseynî

-Bo hunermend Ciwan Şêxo-

**Tu çawan bîra mirinê bûyî?
Hey zalim! Tu çawan hînî bilêvkirina xatirxwestinê bûyî?**

Min digot:

Nebêjin, na nebêjin!

Vê reşgirêdanê ji nû ve bi ser newqa qonaxê de nerêjin.

Dil bi pizota oxirê, na hey zalim! de bila çûkên li ser kaja kenê te bi gurîna xatirxwestinê nepêjin...

Min digot:

Henasa şevbuhêrkan hogirî dûmana lêvên te dibû,

lavlava şermezariyê hildiperikî keviyên kovana te,

velerzîna bazbandan di şiverêyên xewna te de diqurifi,

em li ber asîtanka bişaftina te berzûrî rûperî û dîlberan dibûn,

û di taristana berfireh û navdar a çavê te de û di goristana brîndar a navê te de, di daristana lez-gavên te de, di aheng û saz û awaz û di çêregeha ron-dikên te yên derengmayî de

me bêdengiya xwe , me agir û pêtî û diltengiya xwe bi ser êvara dilê te direşandin û em diqîriyan:

Ji bo çi ey Xweda?

Ma ne ji ber xwe ve dê orga gunehkar di dilkê dil de biteqiya!

Ma ne ji ber xwe ve dê di pirtûka rojan de û di kezeba gulan de mirina çav reşan binimiya!?

Mane ji ber xwe ve dê dar bê bager,

dê şev bê huner,

dê pencere xemgîn,

dê sirûd reşbîn û bê zingîn bimînin,

dê ciwanekî bi تنها, bengîn û şeyda,

bi ser qeşmeriya axa sar de bigiriya?!

Min digot:

De rabe hey zalim dev ji laqirdiya mirinê berde!

De rabe! Nebûna te ji boyî harmoniya talanê kul û derd e!


De rabe! Da ku hezar stiran di şeva Qamişlokê de

bi hev re ji dayik bibin!

De rabe da ku şûna helbestê di hişê tirsê de,

di damarên pirsê de

bimîne



Nizanim kî me ez
Ji bo çi dijîm ez
Zanim ku rojên min û
Dostên min û jîna min diçin bi lez.
Ciwan Şêxo

Da ku Heleba kevnar rondikên te di gupîtka gizingê de hilîne. . .
De rabe da ku bîranînên te ji me re nebin sêdar!
De rabe daku tiliyên te xwe li gerdena xatirxwestinê nealînin,
nebin koremar!

De rabe goristan sar e, dengbêj civiyane, sibehe bê te nabe.
Bîna qehwê gerek bi ser bişirîna te de dabe,
Min digot,

nebêjin, na nebêjin:

Ma rast e ku anuha bi tenha xwe dimîne, bêyî me, bê piyano, bê tûtin,
bê xewn û bê lîska bi zarokên Taxa Xerbî re!!?

Ma rast e em hew rûniştina wî, destşûştina wî, biraştina wî, dibînin ?!
Em hew hêsrên germ, ji çavên wî, bi ser hinarkên şevê de diherikînin ?

Ma rast e ku ew tilî dê bê bizav,

ku lêvên xweşik dê bê xunav,

ku çavên bê xew dê bê sîtav,

ku êş û newa û kew dê bê şîrav bimînin?.

Ma rast e ey hawar! Ku em dê kulîlkan ji xweliya serê çîyan dawêşînin
û li ber serê sazbandan , bi navê koçer û revendan biçînin!!?

Ma rast e ku derza dilê me dê li van dûrewaran bi mirina te jî biderize,
ku giyanê me dê di nav zixtên kêra kêla te de wek çûkekî birîndar
bilerize!!?

Min digot:

Ji kuç û kolanên dudil re, ji paytextên bêzarî û ji mişextiya gawir re,

ji barana destê sibê re,

ji roka ber êvarê re,

ji keskesora çavê miriyan re ,

ji stêrkên westiyayî yên esmanê havîna werz û bîstanan re,

ji xirecira xwêdana sermest ya govendgerînan re,

ji serkêş û dastana birînan re,

ji toza dilnêrm a li ser zuha-bişkojên nîsrîn û gulçînan re

bibêjin!

Na Ciwan na!

Destê xwe ji destê me nerevîn,

zêr tiliyên xwe ji gerdeniya piyanoyê berned!

Bi awirên xwe yên mehreban jena ku di dil de maye nesotîn!

Ji nû ve xwedanê şîniya giranbuha di tengerêyên xwîna şikestî de ne-
livîn!

Ronahiya me bi tenhatiya gorê ned!

De rabe teniko!

De rabe xweşiko!

De rabe jiyana ku ji ber axînan maye, bi birîna koçkirinê,

bi ser serê xewna me de neherifîn!

De rabe bi hestên narîn , bi gulbarîn, sirûda xatirxwestinê,

di hişê bêrîkirinê de biteqîn!

Min digot:

Ma we tiliyên wî bi kesera me hine kirine?

Ma we gulava bîranînan,

"Narîné hey Narîn"

"Tolîkvanê Meyro"

Bi ser canê wî de dakirine?

Ma we gulek berbero xistiye bin serê wî?

Ma we ber bi şîniya çiyê de vekiriye berê wî?

Ma tem û awran, nermebarana fedyokî,

li ser serê wî dilîlandin?.

Ma kevokên bejî û hehecîkên me jî,

xwe bi ser darbestê de diçemandin?.

Ma we tembiya wî li kulîlkên buharê kiriye?


Ma we lepên sevê jiber devê goristanê rakiriye?

Ma we hêsrên me xerîb û sêwîyan li tevî hawarên xwe kirine?

Ma we jê re gotiye:

Ku mirina te Ciwano jibo me herroj mirine?

2/2/1995



Pirsa Gelê Kurd Li Başûr-Rojavayê Kurdistanê

Rastiya hebûna gelê Kurd li Sûriyê ji berê de ye, ji berî ku Sûriya bibe dewlet e û îro jî rastiyeke mezin e li ber çavan. Di qonaxên pêvajoya Sûriyê de, gelêkurd, hertim rola qencî û rindiyê listiye, ji paş ve li kesî nedaye û hergav bi çavên dostanî û biratiyê li derdora xwe nihêriye. Lê mixabin siyaseta dewleta Sûriyê her û her li serê xwe siwarbûye û dibêje "na", Kurd li Sûriyê tune ne û ji bona bicîanîna vê siyaseta tunekirina Kurdan û veşartin û bincilkirina rewş û rastiyan hebûna kurdan dewleta Sûriyê kiryar û siyasatên jêrî dane ber xwe û bikaranîne:

A-Di warê rikgîriya di derheqa çand û zimanê Kurdî de:

1-Guhartin û erebîkirina navên sedên gund û bajarokên kurdan li herêmên kurdî, çi li parêzgeha Helebê (Afrîn û Kobaniyê) û çi ya Heskê (Cizîrê).

2-Qedexkirina bikaranîna zimanê Kurdî û rêgirtin li ber vekirina dibistanan bona zimanê Kurdî an navendên kulturî.

3-Qedaxekirina çapkirina kovaran bi zimanê kurdî.

4-Rê li ber muzîk, stran û folklorê Kurdî di programên îzgeh û televîzyona sûrî de girtî ye.

5-Çavdêrî û kontrola dewletê li ser nivîsarên wergerandî di rojnamên xwe de, peyva Kurd û Kurdistanê ku, carna di rojnamên europî de bikartê, ji ba xwe ji holê dirakin û peyvîne din ji ba xwe bikar tînin.

6-Zêdekirina tengasiyên li pêş de û bavên kurd, gava ku, dixwazin zarokên xwe bi navên kurdî bi nav bidin û herweha navên cîgeh û dikanan.

7-Çembabikirina belabûna stranên Kurdî û bi taybetî ên Şivan Perwer û wekî din.

8-Bêyî destûreke taybetî li bal dezgehên parastina dewletê, zarokên Kurdan ên nûbûyî nayên nivîsandin.

B-Di warê civakî û hunerî de:

1-Qedexkirina navend û kome-lên civakî di herêmên kurdî de.

2-Qedexkirina komik û çalakiyên sportê di herêmên kurdî de, yan jî divê di bin kontrola dewletê û partiya wê ya serdest de bin.

3-Qedexkirina dezgehên xêrxwazî û rindiyê di herêmên kurdan de.

4-Bergirtina sînema û tiyatroya Kurdî

C-Di warê kar û zanyariyê de:

1-Her sal, bi kêmanî, bi dehan xortên kurd ji mafê bi serîkirina xwendina institûtên navincî tenê bêparkirin û li erdê dimînin.

2-Karmend û karkerên Kurd di dezgeh û fabrîkên dewletê de, hertim cihên guhastina bê? û avêtina yekser jî karin.

3-Bêparhêştina xwendekarên kurd ji wan berhem û kursiyên xwendina bilind ku, ji Sûriyê ne li gor protokol bi dewletên europî re peyda dibin.

4-Qedekirina hebûna karmendên Kurd, di dezgehên Sûriyê ên diplomat de.

5-Qedekirina pejirandina xortên kurd di zanîgehên leşkerî û bi taybetî di yên çekên deryayî û firokî de.

6-Tinebûna institût û zangoyan li herêmên kurdî, gelek xwendevanên kurd, bi taybetî keç, neçarî

berdana xwendinê dike.

D-Di warê ekonomî de:

1-Dewlet dest datîne ser erd û zevîyên kurdan û li ser êrebên ku ji cihên dûr anîne, belav dike. Tu hatina aborî ya kurdan namîne û ji neçarî herêma xwe berdîn.

2-Berbendkirina kirîna erd li ber kurdan, belko didin ereban.

3-Ew Kurdên ku li gor zagona 93'yan a 5.10.1962 bûne "ecnebî", ji mafê kar, milk, derketina derve, kertên temwînê û gelek tiştên din bêpar dimî-nin, lewra jî jiyana wan diwartir dibe.

4-Kêmbûna warên kar û berdana kurdan ji kar û dibistanan bêkariyê dighêne dora 75% li herêmê û bi taybetî di nav jinan de. Lewra jî herêmên kurdan li paş dikevin, xelk jê bar dikin û bi nexweşiyên civakê li wir peyda dibin.

5-Her çendî medeyên xav wek genim, pembo, mital, petrol û tiştên din jî li herêmên kurdî henin, lê tu fabrike û karxanên hatin û çêkirinê li wir tune ne û nayên lêkirin, lewra jî problema xizaniyê diwartir dike.

6-Di warê kar de li herêmên kurdî pêşkeşiyê didin kesên şoven û wan di ser kurdan re digrin.

7-Kêmbûna nexweşxane û klînpkan li herêmên kurdî.

8-Intirastruktura herêmên kurdî gelekî ji ya herêmên Sûriyê din paşketûtir e û rê li ber pêşketina civakî-ekonomî digre.

E

1-Herçendî çavkaniyên avê yên herî zengin wek çemê Ferat Dicle û xabûr di herêma kurdî re derbas jî dibin, hîn piraniya çandî ya kurdan li ser baranê ye. Ew jî ji ber tunebûna sistemeke avdanê a nûdem li wir.

2-Bikaranîna dermanên berbendkirî li dij nexweşî û kurmikên çandiniyê, xwê di erdê de pirr

dike, avê gemar dike û tilûr û kêzikan dikuje û herweha gelek nexweşiyên nuh li herêmê peyda dike.

3-Bêserûberiya kolana bîrên er-tiwazî û tunebûna piştgiriya dewletê ji çandina daran re, ava binerd nizim û kêmbûnê dike û ew jî dibe sedemê ji yên zuhabûnê û pêşdehatina berîyê.

F

a) Li gora zagona 93'yan dewleta Sûriyê hemwelatiya (cinsiyet) bê-tirî sedhezâr kurd di 5.10.1962'an de ji wan kişand û gote hûn bêgane ne û nema hevweletiyên Sûriyê ne. Jimara wan niha piştî 33'yan ji 150 hezarî pirtir bûye û niha wek hingê her ji hemû mafên bajartî û mervuvatî bêpar mane. Ne mafê kar, xwendin, bîdestxistina milkan yan avakirina tiştêkî, ne mafê bîdestxistina pasaportê û derketina derve, ne jî çûna otêlan. Her weha wan maf tune bi fermî mehra şikirinê (zewacê) çêkin, navê zarokên xwe yên nûbûyî deynin. Helbet nabe ew beşdarî hîlbijartinan bin. Jixwe hema hinek vê çavsoriya nijadperest bînin zimên ew tene girtin û gunehêkê mezin dikeve hustên wan, êş û lêdana hovane li wan tete kirin. Îro jî gelek welatparêzên kurd jî ber vê yekê di zîndanên de ne.

b) Bi armanca guhertina demografiya herêma kurdî, dewletê planê "kembera erebî" danî û ji bo wilo dest danî ser erd û zevîyên herî baş ên cotkarên kurd li Cezîrê û ji wan stend. Pişt re li seranserî sînorê xwe yê bi Tirkîyeyê re, bi dirêjiya 375 km. û firehbûna 10-15 km., dewletê gundin modern lêkirin û sala 1973'an ereb ji dora bajarê Reqayê anîn wan gundan. Yek buhist erd di destê wan cotkarên kurd de nema û bi çavê birçî dibîne çawa xerîb xêrûbêra erdê bavûkalê wî hiltînin û zarokên wî tazî û birçî ne.

Ji bilî van tevdir û siyasetên

dewletê yê taybetî ku, di derheqê gelê me yê kurd de li Sûriyê têne bi karanîn, û ji bilî plana kembera erebî ya kirêt ku, li gor ya ku wê bi deh hezaran ereb ji derveyî parêzgeha Cizîne anîn û di nav çavên kurdan de bi cîkirin piştî ku, erdên tevri baş û avî li wan belav kirin. Bi ser de ji sala 1962 an ve cinsiyeta bi dehên hazaran (îro hijmar digehe 150 hezarî kurd li parêzgeha Cizîre hatiye qapirandin û dizîn. Vêca yekser ji hemî mafên qanûnî û mirovane hatine bêper kirin. Ne mafê kar û xwendinê ne mafê xwedîbûna traktor an jî parçek erd heye. Ne mafê lêkirina avahiyekê û ne bi fermî mafê nehrkirinê heye. Ne jî mafê bidestxistina pasportê û derketina derveyî Sûriyê heye.

Bi salvegera vê problêma daxuyanîyek û belavokek li Sûriyê ji raya giştî re hate belav kirin. Ji ber wê welatparêz kurd gelek hatin girtin û êş û lêdan dîtin. Îro jî gelek girtiyên ji ber xebatên siyasî di zindanan Şam û Helebê de dimînin.

Baş dixuyê ku milletê kurd li Sûriyê di bin zor û setema siyaseteke şovenî û çavsoyîyê de dijî û piştaftin û jihevixistina kurdan ji zû de bûye armanc û siyaseta dewletê ya fermî û ta îro jî her berdewam e, lêbelê li beramber vê siyasete gelê kurd roj bi roj bêhtir li doza xwe ya milî xwedî derdikeve û ji ya xwe naye xwarê.

Gelê kurd li Sûriyê ne tenê li doza xwe ya milî xwedî derdikeve, lêbelê bi camêrî, bêdudilî û bi sîngeke fereh tevgera xwe ya demokrat, kurdperwer hembêz dîke û ji fedekariyê re hertim amede ye.

Rewşa gelê me û pêdiviyên xwe ragirtinê li hember siyaseta şovenî, dihêle û divê bihêle ku, rêxistinên tevgera netewî ya kurd li Sûriyê destan bidine hev û mil bi mil li ser bîngeha xebateke bêdudilî, li doz û daxwaziyan gel xwedî derkevin, da

ku, xebata gelê kurd bête nûkirin û gavên bi pêş de bêne avêtin. Slogan kerek e ew be ku "Gaveke kar û xebatê çêtir e ji tonek programên bê bizav."

Guhartinên mezin û ne di bîr û xeyalan de, ên ku di rewşa siyaseta navnetewî de peyda bûne, piştî rêkçûna rista dewletên ku bi navê sosyalizmê dihatin naskirin û gelek tişt serûbinî hev bûn. Di vê pêvajoyê de geşbûn û rabûna pêla demokrasîyê û berxwedana bona mafên mirov û gelan baş dide xuyakirin, ku xebata gelê kurd li seranserî Kurdistanê geştir û gurtir dibe. Destkeftiyên li başûrê Kurdistanê -hukumeta federal û parlamenta kurdî- navnişaneke mezin ji kurdan re ye, lewra jî parastin û nûjenkirina vê destkeftiyê dibe û divê bibe erk û barê hemî hêz û partiyên kurd li seranserî Kurdistanê û ew şerê birakujîyê ku li Kurdistanê peyda bûne şerekî xwekujîyê bi xwe ye.

Li rojhilatê Kurdistanê têkoşîn û berxwedana gel her li cî ye û roj bi roj geştir dibe, tevî ewqas dijwarî, û hêrişên terora rêjîma Teheranê ya diktator, şerxwaz, xwînrej û paşverû.

Her weha li bakurê Kurdistanê jî hêriş û çavsoyîya dewleta Anqerê li dijî gund û bajarên Kurdistanê, digel rêgirtin û destdirêjiyan li dijî xebat û berxwedana rojnamevanî, demokratîk û aştiyane û destdana ser parlamenteerên kurd, û ji hev belavkirina wan û bi ser de jî, bombebaran kirin û hêrişên hov û dirinde, û koçkirina bi sed hezaran kurd bi hêla rojavayê Turkiyê de tevî va bûyerê rojane, dîsa jî gelê Kurd dev ji ya xwe neberdaye û her û her li doza rizgariya xwe xwedî derdikeve û li berxwe dide rûreşî ji dewleta Turk re dimîne.

*



DUGIR Kurdisk litteratur tidskrift

Box 3437, S-165 23 Hässelby -Sweden



Tahsîn Taha ...

Oxir be dengbêjo!

*Her ku baskên stiranê hingivîn
roavahiya xewnê,*

oxir be!

*Her ku bêrivanên xewn-şikestî
bêriya guhanên azadiyê kirin*

oxir be!

*Her ku ahenga şîniyê hejiya û
bi ser gulvedana çiyana de rîjiya,*

oxir be!